



Di Stran-2 de, van stran û dûrikan hene hene:

[E'dlê rabe, E'dlê, E'dûlê, Ehmedê Şeng, E'lî Xwarza, E'mê Gazê, E'mê Gozê, Emîne (1), Emîne (2), Emîne (3), Emîno, Êmo (1), Êmo (2), Ereşênê, Evdal Omer, Evdo, Eyšânê, Ezdîn Şêr, Ezê, Farisê Dodo, Ferho.]

Êvarekê bi dengbêjê me yê delal **Eh'medê Ferman** re.

Kelamêrê **Kîkan**, roniya çavan, îxtiyarê civatan, berdevkê maqûl û axan û berdilê ciwan û xortan.

E'dlê rabe

E'dlê rabe sibe ye,
Dengê dîka qebe ye,
Kes li mal a tune ye,
Kêf kêf a min û te ye,
Deynê min li bavê te ye...

Ba rabû, baran rabû,
E'caca keriyar rabû,
Karika pihoş (bêhoş) winda bû,
Gundî, malî bela bûn,
Ez û gewrê pev şa bûn...

Çiya li çiya nêrî,
Werdek ji gola firî,
Xwar bûm, E'dlê ramîsim,

Destê min lê nagerê...

Hat karwanê gamêşa,
Danî bû li binya êşa,
Memkê E'dlê digiwêsim,
Dilê min ji kerban têşa (diêşa)...

Ha der bû, der bû, der bû,
Karwanê E'dlê der bû,
Hemî hêstir û ker bû,
Hemî qantir û ker bû,
Hespê E'dlê qemer bû,
Çekê xorta li ser bû...

Mala E'dlê li neqebê,
Lê hat bayê xezebê,
Derdê E'dlê giran bû,
Da ser siwarê neqebê,
Derdê tolê giran bû,
Da ser derdê kezebê.

Lê lê gidiyê E'dûlê,
Porsorê, gulê hûrê,
Dosta lawikê maqûlê,
Wer ser dora tenûrê.

Lawik E'dlê revandî,
Bir xopana Stenbûlê,
Lê lê gidiyê Edlayê,
Mi d'pozê bavê gayê (1)
Tu li pê soza xwe nayê

Qîza şêxê Teyayê
Xilxala ling kutayê
Kember li navê nayê
Bazina dest badayê

Çav ji zêra hilnayê
Çi b'kim malê dinyayê.

Ev sibe ye, ro zîz e
Ro li erdê dilîze
Derdê min yeke qîze...
(1): " Yek dikare wilo têbigihe: Mi di pozê
bavê, ku mîna yê ga ye, nayê..."

E'dlê!

Edlê rabe sibe ye,
Dengê dîkan qebe ye,
Çax, çaxê min û te ye,
Çaxê nimêja te ye.

Hey lê, gidiyê Edlayê,
Bê sozê, sozwindayê,
Malê dinyê hindikê,
Qelena gewra min nayê.

Sibe bû, dîka qîr kir,
Cotkariya nîr li pî kir,
Rêka ş'keftê d' nivî kir,
Sînga gewrê sipî kir.

Heylê gidiyê Edlayê,
Min sozek bi te re dayê,
Ez tu car nadim terkayê,
Heta bi axa merzela,
Heta bi kêlê kevirê,
Bi şîngîna bêrê hesinî.

Mala Edlê li neqebê,
Lê hat bakî xezebê,

Kul li Edlê giran bû,
Da ser derdê kezebê.

Mala Edlê li jor e,
Dergûşê lor e lor e,
Hêvî ma rebê jor e,

Dê Edlê! Rabe, rabe,
Dilketî çare nabe,
Kes li malê tu ne ye,
Kêf, kêfa min û te ye!.

E'dûlê

Lê Edûlê rabe!
Lo, nabe, qedao nabe, belao nabe,
Ji ber serê min rabe,
Navê revê navekî xerab e,
Bêvila min bilind e,
Zimanê min dirêj e,
Di nav dost û dijmina de, serê bavê min berjêr nabe,
Lo, nabe, welatê xerîbiyê çekek teng e,
Piyê xwe tê ra meke,
Ji me xerîba re nabe bav û keke!
Lo, nabe, belao nabe,
Welatê xerîbiyê çekek teng e,
Debara te dibe, ebûra min nabe,
Şam şekir e, wetenê mala bavê min şirîn e,
Destê min ji heval û hogira nabe!
Lo, nabe, qedao nabe,
Teniya binê beroşê di rûyê min dao nabe,
Şêrîza li ser culhao nabe,
Şevê dihatî, nîvê şevê ye,
Şevê kanûna berfê girtî rûyê erdê ye,
Bozê rewan avêtê dîwarê qesrê ye,

Bozê rewan cemidî ye,
Pîkol fikir kendalê berfê ye,
Keçê rabe, nebe sebebê kuştina lawikê xelkê ye,
Destê xwe bi destê mi de,
Emê berê xwe bidin welatê Kurdistanê,
Emê xwe bavên qewmê çiyayê,
Lê nabe hikmê dewletê,
Nade kaçor û aşar û eskeriya hikumetê!
Lo, nabe, qedao nabe,
Navê revê navekî xerab e,
Navê bavê min mezin e,
Qesra bavê min bilind e.
Di nav dost û dijmina de nizim nabe...!
Lê, rabe, Edûla min rabe,
Tu şa'rê girê de,
Bera navkêla zirav li ba be,
Bera dinya li serê min û te qurîçax be,
Toz û icaca keriyê sor li me rabe,
Ez nakim terka bejna zirav,
Heya celata min nere bajarê Rohayê,
Kindira min nere welatê Kurdistanê,
Li Diyar-Bekrê, dara çinarê,
Derê qela' qapîsê, heyra kindira min li ba be!
Lo, nabe, qedao nabe,
Xewa min tê, ji ber serê min rabe,
Bavê min lok e, barê wî giran e,
Heçî nav û dengê bavê min bihîstiye,
Pîberê (Pêşberê) min nabe!
Lê, Edûlê rabe, şa'rê girêde,
Bera navkêla zirav li ba be,
Destê xwe destê min xîne,
Lingê xwe li rikêba Delexoro xîne,
Emê di Feratê Bêlacokê re,
Di Qerekê Hesên Paşa re,
Emê bi dewletên ecnebî re,
Terkî dinya bin,

Emê bi Romî Paşa re bi neyar bin,
Emê bi mezinê Moskofa re bi heval bin...!
Lo, nabe, qedao nabe, belao nabe,
Hewşa Helebê nabe,
Navkê revê navkî xerab e,
Bêvila min bilind e, zimanê min dirêj e,
Di nav dost û dijminan de berjêr nabe,
Welatê xerîbiyê çekik teng e,
Piyê xwe tê ra meke, ji me xerîba re nabe bav û kek!
Lo, nabe kuro nabe,
Xewa min tê, ji ber serê min rabe,
welatê xerîbiyê çekek teng e,
Debara te dibe, ebûra min nabe,
Şam şeker e, welat jê şirîntir e,
Destê min ji heval û hogirên mala bavê min nabe...!

Strana Ehmedê Şeng

[Ji berhevoka Albert Socin û Eugen Prym ji sedsala Nozdehê St. Petersburg 1887]

Tîpguhastin: **Cankurd**

Bihar e xweş bihar e
Eskerê bikin kar e
Ehmedê Şeng mala xwe bar kir
Di îrandî li bin çiyayê Evdilezîz li pij (piş) ^[1] miqabilî wan neyar e.
Go payîz e xweş payîz e
Eskera ve temîz e
Ehmedê Şeng mala xwe bar kir
Denya bû li Evdilxerabo, pêj (pêş) miqabilî neyar e
Ji komê mamê xwe zîz e
Go: Gêsa kirin rayê
Xalê Xuşabî Gêsa, Keşemanî Gêsa, Sergîsî (Serkîsî) Gêsa ^[2],
Karê xwe kirin (bikin) ji binê vê Bexdayê,
Go: Gelî Gêsa me divêl (divêt) biçim bin çiya ê Evdilezîz,
ser mala û Ehmedê Şeng da
Em dewarekî bînin ji tuxmê vê Leylayê ^[3]

Xalê Xuşabî Gêsa vegirtî dîwan e
Me'qûdê (U'qada) Gêsa li hev civiyane
Go: Xalê Xuşabî Gêsa dibêjid:
Her çî biçît ser mal û Ehmedê Şeng ji mi ra bînin tirş û talan e
Min keçeg (keçek) heye Qemercan e
Ezê bidimê balbûbêd Kurdistan e
Xalê Xuşabî Gêsa deg (deng) hiltîne
Meqûdê Gêsa li xwe dicivîne
Heçî biçîd (biçît) ser mala Ehmedê Şeng
Terş û talanê ji mi ra bîne
Min keçeg (keçek) heye Qemercan e
Ezê bidimê bi cildûn e
Subaye subayeke zû ye
Xalê Xuşabî Gêsa li pişta (bi pişta) êla Gêsa ketiye,
Qîrên diket, hawar û gazî ye
Maqûdê Gêsa derketîne
Sed û pêncî suwarê bi şer tîne
Qesta mala Ehmedê Şeng kirîne
Ji binya Bexdadê de hatiye
Qonax ber qonax de hatîne
Bîst û çar qonax bi rê ve hatîne
Li pêj (pêş) Evdilezîz ketîne,
Sergîsî Gêsa , gelî suwara peya bûn (e)
Ordiya xwe li hara (taxa) bogirîn de
Em biçin seh bikin, qe (ka) xudanê Leylikê li mal e ane (an ne) li mal
nîne
Go: Her sed û pêncî suwara li vê derê peya bûne
Qonaxa xwe li vê derê girtîne
Sê suwar jê suwar bûne
Qesta mala Ehmedê Şeng kirîne
Wekî çûn, fikirîn Ehmedê Şeng li mal nîne
Xêrî xatûnê wî bi xwe rûniştîne
Wekî xatûn fikirî sê suwar ji wê ve hatîne
Go: Xatûnê ji hindav de wê rabûye
Sê kulav jê re deynandîne
Sê balgî jê re anîne

Sê qalûn jê re dagirtîne
Hersê qalûnê xwe kişandîne
Sê fincanê qehwê jê re aniye
Her êg (êk) fincaneke qehwe vexweriye
Taştê jê re çêkiriye
Hersê ji hindav de rabûne
Hespê wan jê re kişandiye
Pê xwe bi rikêbê wê danîne
Hersê suwar bûne
Go: Malî avahî ji xatûnê ne xwestîne
Şûn xwe de zivirîne
Qestê kemîna xwe kirîne
Wekî gihane kemîna xwe, gotî gelî suwar bûn (e)
Xudanê Leylikê li mal nîne
Rabûn her sed û pêncî suwar bûne
Qesta konê erebî kirîne
Wekî li pêş konê erebî ketîne
Xêrî xatûnê fikiriye
Sed û pêncî suwar ji wê ve hatiye
Rabû sed û pêncî kulav deynandîne
Sed û pêncî balgî jê re dagirtîne
Gumguma qehwê jê re kelandiye
Sed û pêncî fincanê qehwê vexwarîne
Sed û pêncî sing ji hespê wan re qutayîne
Sed û pêncî cihor jê re anîne
Deh pez jê re serjê kirîne (şerjê kirîne)
Şîva xwe xwarîne
Wê şevê nivistîne
Dîtra rojê deh pez jê re serjê kirîne
Wê rojê roja xwe qedandiye (qedandîne)
Axir hefd (heft) roja li mala Ehmedê Şeng rûniştîne
Roja heştê rabûn karê xwe kirîne
Her êg (êk) rabû hespê xwe mexes kiriye
Paşê mexesê gulweşîn kiriye,
Paşê gulweşînê tîmar kiriye
Zîn li ser piştê danîne

Rabûn çekê xwe hılanîne
 Şîr (şûr) li piştê xwe şidandîne
 Rabûn her sed û pêncî suwar bûne
 Rumê xwe bi destê xwe girtîne
 Ji konê erebî derketîne
 Li piştta mala terş û talanê Ehmedê Şeng lê dayîne
 Terş û talanê Ehmedê Şeng wê biriye
 Wê rojê heta îvarê ajotiye
 Wê şevê rûniştiye
 Dîtra rojê subehî ajotîne
 Heta êvarî çûne
 Wê rojê dîsa ajotîne
 Eve rojê sêyê tamam bûye
 Ji nû Ehmedê Şeng vehatiye
 Cêrî xatûnê ji pêj (pêş) ve rabûye
 Cilavê Ehmedê Şeng girtiye
 Ehmedê Şeng peya kiriye
 Leylika Qemer ser merbetê girêdayiye
 Kulav ji Ehmedê Şeng re daniye
 Fincanekî qehwê jê re kelandiye
 Qalûne jê re dagirtiye
 Taştê jê re çêkiriye
 Qed ne gotê h'al û h'ewalê me (û) Gêsa çiyê
*Gotê: Xatûnê, rabe balgî ji mi re bîne, ezî rehtim,
 da ez bênekê serê deynim. Rabû carekê cih jê re danî,
 balgî deyna bin serê wî. Ehmedê Şeng serê xwe danî
 ser dinivît. Cêrî xatûnê li bin (ber) serê Ehmedê
 Şeng rûnişt. Rondikê ji çavê xatûnê barîn,
 rondikek ser rûyê Ehmedê Şeng ket. Ehmedê
 Şeng çavê xwe vekir, go: Herê, xatûnê, tu çima
 digiriye? Gotê: Ehmedo binve (raze) ez nagirîme.
 Gotê: Çê nabî, tiştêg (tiştêk) wê qewimî, ji mir e bêje.*
 Go: Ehmedo, çi ji te re bêjim? Wekî seharê rabûm,
 Ez fikirîm sed û pêncî suwar ser konê dagirtiye (dagirtîne)
 Ez rabûme pêjî (pêşî) evan her sed û pêncî suwar min peya kirîne
 Sed û pêncî sing min jê re qutayîne

Sed û pêncî merbet min jê re deranîne
 Dewara xwe pê girêdayîne
 Sed û pêncî cihor min jê re anîne
 Sed û pêncî kulav jê re deynandîne
 Sed û pêncî balgî min jê re anîne
 Sed û pêncî qalûn min jê re dagirtîne
 Min deh pez jê re serjêkirîne
 Taştiya xwe xwarîne
 Wê şevê dîsa bi vî terzî min qedrê wan girtiye,
 Hefd roj û heft (heft) şeva li mala te rûniştîne
 Binêr çend mesrefa te lê çû ye
 Fekrê (bifikrê) çend bê me'rifet derketîne
 Rojê heştê rabûne
 Tang û baletangê xwe şidandîne
 Li hespê xwe suwar bûne
 Li piştta konê erebî ve ketîne
 Fikirî (fikirîn) Ehmedê Şeng ne hatiye
 Rabûn li terş û dewar vedayîne, birîne
 Gotê: Xatûnê xema hilmegrem (hilmegire), biray Ella (Ellah) û eman
*Ella, sed cara û sed û pêncî suwarî di gêsa bûn, ezê mêra jê kujim
 (bikujim), ezê gilyê xwe vegeirînim. De rabe xatûnê Leylikê kar bike.
 Rabûn zîn ji Leylikê kir, mexes kir, pajî (paşî) mexesê gulweşîn kir,
 pajî (paşî) gulweşînê tîmar kir, zîn ser piştta Leylikê danî, tang û
 baletangê Leylikê şidandin, cotêd qerebîna pi (bi) tenaştê (teniştta)
 Leylikê danî, cotê demance pi (bi) teniştta Leylikê da danî, cotê
 zerga pi (bi) teniştta Leylikê da anî. Rabû Ehmedê Şeng cezmê xwe
 wergirt, mital avête milê xwe, şûr li piştta xwe girêda, ruma
 xeyzeranî bi destê xwe girt, xatûnê rikêba Leylikê girt,
 Ehmedê Şeng pê xwe bi rikêbê danî, li ser piştta Leylikê suwar
 bû. Wekî Ehmedê Şeng piştta konê erebî ket, Leylika Qemer gehgerî
 kir:*
 Go: herê Leylikê minê, tu çima gehgerî dikiye?
 Miqdarê saetek li çeraxê konê erebû (erebî) gerhayîye
 Ji nû dewsa talanê hilaniye
 Riya sê roj û sê şeva li biniya gelyê Zerzevanê,
 li pêşiya suwarê Gêsa girtiye.

Go: Xalê Xuşabî Gêsa vê dibêjît:
Dilê min bi hêbe hêbe
Li mi (min) xweş têt ciringêna cotikê di van rikêba
Çendî min god (got) hewe naçin ser malaw (mala) Ehmedê Şeng,
Li (Lo) suwarekî qewî bi eçêb e
Xalê Xuşabî dibêjid: Hanê, Ehmedo mi nezanî,
Salekî hatî ser me qewî bi giranî,
Li (Lo) Ehmedo me nizanî terş û dewarê te ne, me pi (bi) xeletî vê anî
Ehmedî gotê: Ez Ehmedim, Ehmedê dînim
Ez tang û baletangê Leylikê Qemer qewî dişidînim (şidînim)
Biray Ella û eman Ella, li binê vê beriyê,
Hûn sed û pêncî suwarî di Gêsanin
Li binê vê beriyê, ez î suwarekî pi (bi) tinê her yekim
Go: Ehmedo, wene wene,
Mêra ji mêran qewî hîv hene
Biray Ella û eman, me ji xwe nizanî ew terş û dewarê te ne
Go: Heyla gidya nezano, hela gidya nezan e
Heva sed û pêncî suwar bi hev ve (re)
li ser konê erebî vê girtî cerdekî qewî giran e
Sube ye, çî subeyek e hîne,
Hûn sed û pêncî suwar li der konê erebî peya bûne
Sed û pêncî sing ji wa (wan) re qutayîne
Sed û pêncî merbed ji wa re deranîne
Hewe dewarê xwe pê girêdayîne
Sed û pêncî cihor ji wa re anîne
Sed û pêncî kulav ji wa re deynadîne
Sed û pêncî balgî ji wa re anîne
Sed û pêncî qalûn ji wa re dagirtîne
Sed û pêncî fincanê qehwê ji wa re anîne
Kera jin û magî serî gayno! ^[4]
Li binê vê beriyê êdî çî xeber li navbêna min û hewe navête dane
Go: Sube ye çî subeyeke hîne
Sed û pêncî suwarê di Gêsa li hev civîne
Go: here Ehmedo, me xwe avête bextê Leylikê,
Me xerez digel te ne bû,
Terş û dewarê xwe ji binê vê beriyê vegefirîne.

Go : Ehmedê Şeng (li) Gêsa kir gaziye
Gazî Xalê Xuşabî Gêsa kiriye
Gazî Sergîsî Gêsa vê kiriye
Go : Me ray û bextê Leylikê dayiye hewe,
Terş û dewarê min vegeŕînin, hewe cihê jê aniye
Vêca Xalê Xuşabî Gêsa god (got) gelî Gêsa:
Ew suwarekî bi tine ye
Em pi (bi) sed û pêncî suwar in,
Em neşêyn careg (carek) dî vegeŕînin
Karê xwe bikin, em dê şerî kin.
Go: Sube ye çî subeyeke hîne,
Xalê Xuşabî Gêsa tabûra xwe girtiye
Berê xwe Ehmedê Şeng ve dayiye
Vê nêzîkî Ehmedê Şeng dibiye (dibûye)
Ehmedê Şeng gazî Xalê Xuşabî Gêsa kiriye
Go: guneha we li stoyê we bit
Carekî Ehmedê Şeng li ser xwe rabûye
Ruma xeyzeranî hejnadiye (heşandiye)
Ser û binê rumî vêgra gihandiye
Rumî li nêv guhê Leylikê vedaniye
Carikê rikêbê Leylikê guvaştiye
Li çarexê suwarê Gêsa gerhayiye
Xwe li (di) koma suwarê Gêsa dayiye
Ji rexa rojavayê li rojhilatê derketiye
Serê bîst û pênc egîda vê biriye
Careg (carek) dî hat li cihê xwe sekiniye
Eskerê Gêsa li hev ziviriye
Pi (bi) Xalê Xuşabî Gêsa kir gaziye
Maqûlê Gêsa li hev civiye
Dîsa tabûra xwe girtiye
Berê xwe bi Ehmedê Şeng ve dayiye
Ehmedê Şeng ji eynê xwe der ne aniye
Ehmedê Şeng li ser rikêba vê rabûye
Wekî ruma xeyzeranî hejandiye
Ser û binê rumê vêgra gihandiye
Rum nêv guhê hespê da daniye

Rikêb Leylika Qemer şikandiye
Go: Subhanê ji e'zemeta Xwedê,
 Mînayî birûska biharê Leylika Qemer vê firiye
Li çarexê e'skerê Gêsa geriye
Eskerê Gêsa bi hev da şidandiye
Xwe li koma eskerê Gêsa dayiye
Ji rexa zozanê rexa beriyê ra derketiye
Ji qewlê qaîla dibêjin bîst û şeş egîd jê avêtiye
Carek dî Mihemmedê (Ehmedê) Şeng ziviriye
Hatiye li pêj (pêş) eskerê Gêsa sekiniye
Ruma xwe di erdê da çikilandiye
Xalê Xuşabî Gêsa dikit hawar û gaziye
Li binê vê beriyê li me teşqiliye
Erzê Gêsa (vî) şikandiye
Xalê Xuşabî Gêsa dikid (dikit) gaziye
Magûdê Gêsa li hev civiye
Evan tabûra xwe girtiye
Berê xwe bi Ehmedê Şeng ve dayiye
Ehmedê Şeng (li) Xal Xuşabî Gêsa kir gaziye
Me ray û bextê Leylikê vê rabûye
Wekê ruma xeyzeranî hejandiye
Ser û binê vêgra gehandiye
Rum nêv guhê Leylikê da daniye
Rikêb Leylika Qemer şikandiye
Subhanê ji e'zemeta Xwedê,
 mînayî birûska biharê li erdê vereşiye
Li çarexê eskerê Gêsa geriye
Eskerê Gêsa pevda şidandiye
Xwe li koma eskerê Gêsa vedayiye
Ji rexa zozanê li (di) beriyê ra derketiye
Ji qewlê qahîla (gotiyara) dibêjin, bîst suwar jê avêtiye
Careg (carek) dî Ehmedê Şeng ziviriye
Li çarexê eskerê Gêsa vegeriye
Eskerê Gêsa pêgve (pêkve) şidandiye
Eve sed û bîst û pênc suwar jê avêtiye
Xal Xuşabî Gêsa kir gaziye

Yeman û dexîl ya Ehmedo,
Me xwe avêt bextê Leylikê,
Em dê terş û dewarê te vegeřin.

*Go: de herin peya bin , dewarê xwe berdin nav talanê û bêjin me
ray û bextê Leylikê dayiye hewe. Yeg (Yek) ji van kevne xulamê
Ehmedî bû.*

*Vê gavê dît gazî kirê Sergîsî Gêsî hay bînin û xwe hef (heft) sala tu
xulamê min bû,*

*tu vê carê şerê midkî (min dikî). Go: Xal Xuşabî Gêsa ez bi xurto (bi
zorê)*

*îrandime. Go: de here suwar bibe, bila ew talanê bajon. Sergîsî Gêsî
çû suwar bûye.*

Go: Dilê min î bi hêt e hêt e
Sergîsî Gêsa bi çirkînî ve tête
Pi (bi) xwe avête bextê Leylikê,
Qalûn da bi destê Ehmedê Şeng darête
Bi hiceta qalûnê û dagirtinê,
Rumekî li depê singê Ehmedê Şeng da,
Ji ser qelpûsa zînê hilavête
Sergîsî Gêsî gazî Xal Xuşabê Gêsa ve kiriye,
Herin suwar bin, min Ehmedê Şeng ve kuştiye

Go: Gidîno, suwar bin werin, belkî em Leylikê bigrîne (bigirine).

Wekê suwar bûn hatin Leylikê li çarexê termê Ehmedê Şeng geriye.

Nahêle êdî çî

*derb êdî vê bikevît, devê xwe avête, danî ser pişta xwe, di rexa dî re
qulipî,*

*careg (carek) dî devê xwe avêtê, danî ser pişta xwe, di rexa dî re
qulipî,*

ew çend suwarê Leylikê cemîa'nd neşeyn Leylikê bigirin...

Leylikê kirî ger e
Dûvê xwe kirî qenter e
Çavê xwe kirî peyal e
Simê xwe kirî kopal e (Gopal e)

Ji binê wê beriyê, li binya Zerzevanê
Li nihala Şorgu-Morgu-Korgu
Rêya sê roj û sê şeva ji berî mexribê
Heta pajê (paşê) î'şa (şîva)
Hewar gihandî mala...
Diye Ehmedê Şeng vê dibêjî:
Dilê min bi birîn e
Kose Otmano malig (malik) wêran e
Serê xwe ji kûrxanê biderîne
Bi ray Ella û eman, Leylika Qemer vevatî,
zîn î vala, rikêb tijî xwîne

Go: Li Dodikya bû hewar e
Suwar bûn ji biçûk û mezin û tufala
Kose Otman vê dibêjid: Kera jin magê serî gano!
Kesek ji mala xwe nabit ji xeyrî mala Ehmedê Şeng
Sêsed û pêncî suwarî ji xwe mala,
ji xeyrî xeybanî ruvala

Go: Sêsed û pêncî ji Dodikiya suwar bûne
Kose Otman, Kose Otman (Ne'man), (Kose) Şahîn, hersê suwar bûne

*Kose Otman dibêjid gelî Dodikiya, Wekî em sêsed û pêncî suwar biçin
li ser êla Xalê Xuşabî Gêsa, li ser êla Keşmanî, li ser êla Gêsa, Sergîsî
Gêsa, em hemiya qud*

*(qut) bikin, qet çî naniş (namûs) tê nine. Go: Kose Otman, te çewa
divêt? Go:*

*Me divêt ez bi tinê herim Kose Şahîn got: Tu naçe, ez dê bi tinê çim.
Kose Ne'man*

got: Na ez we nakim. Go: Pa dê çewa çêbit?

Kose Otman got: Dilê min pi (bi) kovan e
Her sê Kose suwar bûn û Osman e
Êdî Dodikiya hemî vegeerîne li malan e
Hersê egîda xar berdane
Leylika Ehmedê Şeng vê li pêşiya wan e
Her çar suwara xar berdane
Sê roj û sê şeva ajotin li beriyê û berîstan e

Sergîsî Gêsî nobedarê wan e
Wekî fikirî serê suwara derket, çû xwe avêt bextê Kose otman e
Go: Sergîsî êsî, tu kevne xulamê meyî
Here mala xwe ji êlê de bêxe
û pajê (paşê) em dê bi ser êlê da bigrin
Çû mala xwe derêxist
Go: Sube ye çi sube ye
Dilê min pi (bi) kovan e
Her çar suwara xar berdane,
Bi ser êlê Xalê Xuşabî Gêsa, Sergîsî Gêsî ve girtî,
cerdekî qewî giran e

Li nav êlê Xalî Xuşabî Gêsa bû qiyamet û axir zeman e
Bi şer û qiyametek qewî giran e
Toz bilind bû li ber esman e
Go: Iro ew roje roja egîdan e
Xwîn herikî li ser terefê konan e
Bû roja qiyametê û axir zeman e
Bû çûngçûnga van rikêban e
Bû xîlexîlê di van hespan e
Bû bîrqbîrqê di van şûran e
Qîrênê evda çû esman e
Bî (bû) roja qiyametê û axir zeman e
Ew deşta tijî bû ji keleşê wa insan e
Go: Subhane ji e'zemeta Xwedê
Kose Şahîn, Kose Ne'man, Kose Osman e
Darêxistin ev terş û talan e
Darêxistin e'rz û eyal tev li jinan e
Hemî dane ber xwe înane

*Miqdarekî hatin Kose Etman gote Kose Şahîn: Me divêt em termê
Ehmedê Şeng bibînin, bêje Leylikê ew dizanît? Wekî Kose Etman çû
nig Leylikê sekinî, go
Leylikê minê, delala dilê minê, axir em nizanî (nizanin) kanê termê
Ehmedê Şeng li kêrê ketiye.
Leylikê serê xwe hejand, go: Werin. Kose Etman û kosêd Şahîn herdu
vêraa çûn.*

Ev êdî terş û talan da ber xwe birin. Ew herdu li pê Leylikê ketin, şûn li binya gelyê Zerzevanê, birin ser termê Ehmedê Şeng sekinîn. Vêca herdu peya bûn, herdu li ser termî peya bûn. Wekî fikirî rumekî li ser perrê (perdêt) dil vê dayî, li rexa qulincê re vê derketiye (derketî). Rabûn term hılanîn ser piştê Leylikê danî (danîn), girêda(n) û herdu suwar bûn, ajotin, gihane terş û talanê, terş û talanê xwe ajotin heta birin li nava malane. Vê carê rabûn çil pêncî suwar suwar bûn, çûn konê Ehmedê Şeng li bin çiyayê Evdilezîz, konê wî bar kir, da ber xwe, anî hat, konê wî li perrê êlê danî. Heçî Sergîsî Gêsî xulamê Ehmedê Şeng bû, got: tu here li mala Ehmedê Şeng rûne, îna mala Sergîsî Gêsî bar kir, çû danî li konê erebî da, Leylika Qemer ser merbetê girêda. Sê roj û sê şeva êmê xwe nexwar, îna rabû, kurek Ehmedê Şeng hebû, ku ser piştê Leylikê suwar bû, Leylika Qemer bi herdu çava digirît, bi her çar linga pêkole ti(di)kit. Diya Ehmedê Şeng rabû bandikî bi Leylika Qemer, got:

*Dilê min î bi vê heybetê
Bejna Ehmedê Şeng stûna li ber vê xîvetê
Herê Leylaya minê,
Delala dilê minê,
Çi xema hilmegire, axir roja qarin û qarêna
Pi (bi) serê mêrxasa hervetît (hervetê)
Vêca kurik ji ser piştê peya bû, leylika Qemer hejand qeyda
xwe şikêna, merbeta xwe şikêna, carekê çû bin xîvetê, devê xwe avêt
gehpîra stoyê Sergîsî Gêsî,
darêhişt, avête ber pê xwe gere li ser kir, kuşt.*

Birê Dodikiya li dîwanê rûniştîne. Kose Etman go: Gelî Dodikya hûn çî dibêjin?

Eve heywanê me eyan zanî evê ha kuştiye. Ina rabûn herçî mirovê li mala

Sergîsî Gêsî hebûn hemî înan danî(n) li ber piyê Leylikê, yeg (yek) bi yeg (yek) şerjêkirin (serjêkirin).

Leylika Qemer serê xwe hilanî û şîhî,

ji nû ve çar cihor jê re anîn, serê xwe kir cihorî da, a'îlqa xwe xwar.

Ji nû dilê van jig (jî) serhed bû. Ewan ji nû zanî vê

carê Sergîsî Gêsî Ehmedê Şeng kuştiye.

E'î Xwarza (*)

Wardiyana şewitî, xweş Wardiyane,

Bazidiyê gundê di filane,

Çema Bişêriyê bi mêrgan û çîmene,

Kendê Bazîdê cihê Nijdan û Celaliyane,

Çi dema Hemzê konê di reş lê vedane,

Digerînit li koçkan û dîwana,

Sibeyekî, Hemzê serê xwe li ber konê di reş dihilînî,

Dûrbînê li ber çavê xwe digerînî,

Tewqa suwarekî li binê mala wê dibînî,

û ewî suwarî bi Îsivê Gozalê dişebhînî,

Gotî: Temo, lo lawo! Egîdo! Lo lawo!...

Dê tu lez ke (bike) , bilezîne,

Xwe bi extexanê re bigihîne,

Kûçek Stenbolê ji extexanê biderîne,

Zîn bi çar qaîşa li pişta kûçek Stenbolê bişidîne,

Li ber qerpûza zînê biçikilîne ortek û karzûna,

û xwe di binya mala re bigehîne,

Siloxdana vî suwarî ji min re bîne,

Heke suwarê me xuya bit, bêje:

“Babê min Hemzê gelek selam û kalamê qedîm libat kirine”,

û bêje:

“H’al û hewalêd qaçaxêd me li zozanê jorî çî ne?”

Heke suwarê Celaliya bit:

“Malêd me du cilpa ne”.

Ditirsim vê sibeyê talanekî ji xwe re bikişîne.

Temê lez kirî lezandiye,

Kûçek Stembolê ji extexanê derantiye (der aniye),

Zîn bi çar qayîşa li piştê şidandiye,

Pê xwe li rikêba avêtiye,

Xwe li biniyê mala re gihandiye,

Berê xwe dayê, ewê suwarî Isivê Gozalê bi e’ynî ye.

Gazî kirê: Isivo, lo, lawo!

Gava çavê min bi çavê te ketiye,

Rayê pişta min qetiye,

Kezeba dilê min heliye,

Ji min re bêje:

“Hal û hewalê di qaçaxêd me li zozanê jorî çî ye?

Wey la li min diranê!

Isivî gotê:” Temo lo, lawo!

şikira mîrê mezin be,

Nanê me biriye be,

Dewê me qeliye be,

Haşiya (heyîna) konê me sot be,

Navê qaçariyê li mala şêrê li darê dinê qet tune be!

şevê dî ne şeva dî, Emerê Yûzbaşî di gel gidî babê bînbaşî,

Mixoyê Gozalê tabûrekî eskerî Anatolê bi serbirra alêd me girtiye,

Bîst û pênc kurî law, destê wan bi darê kelemçê daye,

û berê wan daye Erziroma rengîne,

Behsê kuştina wan heye û berdana wan qet tu nîne...”

Gava Temê wa bihîstiye,

Celabê kûçek Stembolê zivirandiye,

Qesta kona mezin kiriye,

Ji babê xwe re gotiye,

Erê, babo! hatina vî suwarî bê oxrî ye,

û ewî suwarî Isivê Gozalê bi e’ynî ye.

(* Binêr rojnameya Roja Nû (1943-1946), Beyrût- Lubnan.

E'mê Gazê (E'mê Gozê) (*)

Ebdilhadî Mihemmed

Wey la wayê, wey la wayê, de wayê...

Bişarê Çeto bankir (bang kir) E'mo lawo!, were rayê,
E'skerê Romî û nefîra'm a bîst û çar e'sîra girane,
Dawî nayê.

E'mo bankir, Bişaro! Lawo!,
Şahidê bavê şemso gelek hene,
Bi eşîra ewilî, mi gelek zabit û onbaşî û çawîş kuştin,

Meytê wan avêtin, serê wan kirin loda xwe a kayê...

De lêda!...talî E'mo de lêda, pozberano de lêda... (lêde)

E'mo bankir, Bişaro lawo!

Nigê mi di qeydê da,
miftê qeydê li şemso Xanimê (1),
li esrax û banê qesrê da, Dilê mi dilekî dîn e.
Şemso bankir:

Kekê Cemîlê mêzeke, birek malê koçera,
li zîwankê Saço, li sadek a bavê Melko,
Li kevrê bûk û zava, li tenîşt a malê me danîne.

Ez bal a xwe didimê, sibe ye,
pênc swar (suwar) tên û dilezînin,
Siwarê pêşî Meh'medê Derwêş e,
yek jê Elîkê Elîkawî ye,
yek jê Mecîdê Segman e,
yek Xalidê Xwedê da ye,
ê dawiyê Elî yê Matkî ye.

Bi texmîn vê sê bi ser koza lawê Gazê da dica'dînin,

Tirsam (tirs a min) tê ji wê tirsê, wê koza lawê Gazîkê,

Kozik a Karanê, wê bikin qitîk û xwîn e.

Şemso bankir Hesênê Osman bavê min vê,
sê (ger) tu mêr be,
devê canfidayê li şibak û li banê qesrê xîne.
Bike tu van her pênc siwara,
ji ser koza E'mê Gazê vegeŕîne.
Şemso bankir, Cemîlê!, sibe bû,
bila şerek çêneba, li Kelekanê koçera,
li pozê bîra, bi bîre.
Mi dî ji êvara Xwedê da,
dengê top û teklikê Bişarê Çeto,
Qaymaqamê Zoqê, ji êvara Xwedê da,
li ser serê E'mê Gazê,
nala (nola) çûçikê ser hêlîna, Wîlewîle.
Şemso bankir, Hesênê Osman,
kurê xalê ! îro derba bavê Cemîlê,
sibe bû, dilê mi dilekî li dîne.
Bişarê Çeto bankir, Meh'medê Derwêş!
bavê mi tu çawa ye?
Tu îro bi ser koza E'mê Gazê da, bikudîne,
Tu enextara mîryê (mîriyê) ji destê wî bi derxîne.
Meh'medê Dewrêş bankir, Bişaro lawo!,
Madamkî (madam kî) te ez xwestim, sekna mi tu nîne.
Henê bankir Cewê, Cewê bankir Seyrê,
Seyrê bankir Meh'emedo lawo!
Îşê te bi îşê E'mê Gazê û Bişarê Çeto tu nîne,
E'mê Gazê wê te bikuje,
heyfa dijminiya, kîna kevin,
wê bi serê te derxîne.
Meh'emedê dewrêş bankir: Seyrê lê dayê!
Heger ez najom ser koza E'mê Gazê,
Bişarê Çeto û Mecîdê Segman û E'merê Perîxanê,
wê li kozê xanimê xwe rûnin,
Wê xwe li cem jinê xwe,
Xwe bi pesinîn in
Wê laf û forta li kurê te bikişînin,

Bişarê Çeto wê bibêje:

Min Meh'emedê Dewrêş li E'mê Gazê e'limand,
Nikanî bû E'mê bikuşta û enextara Romê ji ber hilîne.
Ezê vê sê (sibê?) bi ser koza E'mê Gazê da, ezê bikudînim,
Qedera çî hebe, wê serê xwe bibîne.
Şemso bankir Cemîlê, heke sibe bû,
Bira şerek çêneba li Zewkanê,
Saço li Sadeka,
bavê Melko li Çardaxa,
bavê şebûkê li Kevrê Bûkan û Zava,
Sibe bû, dengê top û teklikê Bişarê Çeto
û qaymaqamê Zoqê ji êvara Xwedê da,
li ser E'mê Gazê tê, nala girgira ewran û tava....
Bişewite mala qaymaqamê Zoqê,
Bişarê Çeto û Meh'emedê Dewrêş, lawo !
te malik ne ava,
Te hicûm kire ser koza E'mê Gazê,
birîna E'mê Gazê,
li nabeyna herdu çava...
Baxems bişewite, bi newale ...
Şemso bankir: Cemîlê!,
hekê (heke) ez bala xwe didimê,
vê sê şerêaliyê E'mê Gazê, Gêra Bênderê,
kozika karanê şer seh'abe ji nîro şûn da,
Şer qulibî ser banê qesrê Kela,
ba Xemsê, milê Hesênê,
Osman kurê xalê Kewê bi kar e.

Dilê mi dilek î li dîn e, Şemso bankir:

Hesênê Osman mêzeke Meh'emedê Dewrêş
û Xalidê Xwedêdayî, Elî yê Elîkawî,
E'mê Gazê kuştin,
dikin enextara Romê ji dest derxînin.

Bavê mi tu mêr be,
devê kuçûk çapiliyê li şibaka jorîn xîne,
bike tu qapaxa qafê Meh'emedê Dewrêş bifirîne,

heyfa E'mê Gazê Hefsadê kela Baxemsê jê hilîne.

Hesen bankir Şemso:

Xwarzê! enextar di destê xalê te da germ bûye,
Ez kê m digirim zêde dixîne,
tu Balçîqa devzirav,
bi destê kurê xalê xwe gihîne,
gava şemsa dike û dilezîne
paniya qunderê hildikişîne,
Balçîqa devzirav li cem Hesenê Osman datîne.

Hesenê Osman bankir şemso!
tu îjarê (îcarê) derbê kurê xalê xwe,
bi çavê serê xwe bibîne,
Gava Hesenê Osman deste li balçîka devzirav dixîne,
li bejna Meh'emedê Dewrêş die'dilîne,
Qapaxa qafê Meh'emedê dewrêş difirîne,
Doxîna şelwerê Elî yê Elîkawî diqusîne,
Heyfa E'mê Gazê, bavê şemso,
Hefadê kela Baxemsê jê hiltîne.

(*) Binêr li quncikê stranvaniyê ji rojname ya **Roja Nû**, Hejmara 20.09.1943, ku salên 1943-1946'an li Beyrûtê, Libnanê, derdiket.

(1) Şemso xanim dayîka E'mê Gozê ye.

E'mê Gozê (*)

Bilind Sorçî

E'mê Gozê pismamek hebû, bi navê **Hesenê Osman**.

E'mê dilmayî bû. Seba hindê mala xwe bir bû dûr li zozana.

Rojekê hindê muxlacîker li destê **Bişarê Çeto**, ku ew jî qaymeqamê Osmaniya bû,

direvin û diçine mala **Hesenê Osman** li navçeyekî, ku digotinê.

" Kozê Koranî ba Xemsê Mîra".

Hindê **Bişarê Çeto** pêve bû, ku Hesên wan muxlaciyan
teslîm bike, lê **Hesênê Osman** digot: " Em çî cara qaçax û muxlaciyan
teslîm bi destê dujminê nakeyn, bela yê xwe ji me veken,
çî feqîr û jarane dekuEQ \O(s,,)tinê.

Heke tu mêrî, were meydanê, ez û tu bi tinê." **Bişarê Çeto** go baş e.

"Herduka ta yê çepera xwe dirust kiriye.

Hesên digote **Bişarê Çeto** ba dora te bit cara ewweliye.

Bişarî çavê xwe li ser darê tivingê şidandiye.

Bi hemî keyfa dilê xwe nîşan li Hesênî girtiye.

Bişarê Çeto gurmijîn li tivinga xwe haniye.

Bi ranê Hesênî keftiye, kar lê kiriye.

Vêca Hesênî digote **Bişarî**:

Xwe bo min bigre, gera min hatiye.

Çar hengost serê xwe bo min diyar bike bi dirustiye.

Hindî **Bişar** bû mêreke kal e,

Bi fend û fêl xwe rizgar kiriye.

Li ciyatî serî diyar ket li ser çepera,

kilaw û desrokê xwe li serî starî daniye.

Hesên li gel teqîna tivingê,

kilaw û desrûkê **Bişar** têhildaniye.

Belê **Bişar** bi tîqe tîqa kenînê, xwe diyar kiriye...

Got: Hesên! tu biçûkî nefamî,

hêşta fend û fêlê mêra nezaniye.

Piştî hingê Hesênî kaxezek da jinka xwe,

bibet bi hawariye.

Bo pismamê wî E'mê Gozê li Zozana joriye.

Ew serê duwazde salane li eşîrê dilmayî ye.

Şemsîxan jinka Hesênî lez kir û lezandiye.

Xwe bi zozana jorî ra gehandiye.

Neçûtealiyê jinka, bialiyê mêran bi jor keftiye.

Wextê çavê E'mê Gozê bi Şemsîxanî diketiyê.

Li hêrsa dilê xwe da gelekaciz û medlûl biye. (melûl)

Got: Xêre? Şemsîxan! te çî xeber bo meaniye.

Çi cara jinkê me lialiyê mêran bi jor nekeftiye.
Şemsîxanê serhatiya Hesênî bo E'mê gotiye.
Diyê E'mê Gozê li mal guh li galegalê wan dibiye.
Lez kir û lezandiye.
Xwe bialiyê mêran gehandiye.
Go: Kurê min! E'mê min!
li binemalê babê te kesek nedîtiye.
Hindî te Umir biket,
Kes li ser cî û balinga nemirdiye.
Li dûmahiyê ez dê hême (dê bême) ser termê te bi eyniye.
Eger birînê te li sînga bit, tu li babê xweyî bi dirustiye.
Eger birînê te li piştê bit, tu li kurkên xulamiye.
E'mê yî digel duwazde pismama, lez kir û lezandiye.
Xwe bi « Gozê Koranî ba xemsê mîra » gehandiye.
Dît Mela yasînê li ser Hesênê Osman dixwêniye.
Wextê çavê Hesênî bi E'mê Gozê ketiye, êdî tamam biye.
E'mê Gozê digel duwazde pismama,
li Gozê Koranî tapî lêdayiye.
Wextê leşkerê Bişarê Çeto,
guh li ne'retînê E'mê Gozê dibiye.
Destê wan li ser darê tivingê şil dibiye.
Herdula deng li leşkerê xwe dikiriye.
Tapî û çepera li Gozê Koranî toz û dûman digirtiye.
Bişarê Çeto li leşkerê xwe dikete gazî û qîriye.
Li spêdeka zû heta ku roj li esmana berz dibiye.
Sê sed û şêst mêr kujane û birîndar dibiye.
Şeş pismamê E'mê kujrane û şeşê dî reviyê.
E'mê Gozê bi taqê tenê li meydanê disekiniye.
Belê Bişarê Çeto baş mêraniyê E'mê Gozê dizaniye.
E'mê Gozê bi sê denga gazî Bişarê Çeto kiriye.
Ewa min lingê xwe li qeyd û merbeda girêdayiye.
Kîfla qeyda li piyê min, min bi xwe havêtiye.
Çunkî çi cara revîn bo me Kurmanca nebûyî ye.
Sê siwar li dûr bobik (obik : komik) Bişarê Çeto dihatiye.
E'mê bi sê teqan her sê siwar êxistiye.
Wextê Çeto bi çavê serê xwe ev kare dîtiye.

Go: E'mo! te sed cara heyfê Hesenê Osman kiriye.

Ewan siwaran êk bira yê min bû,
du yê dî pismamêd min bûn,
hatibûn li beyna me biken sulhatiye.

Kuro! E'mo! te ucaxê me kûr kir bi êk (yek) cariye.

Bişarê Çeto gelek bi fen û fêl bû,
tiqey (1) li xwe birriye.

E'mê we zanî Bişar nemaye,

xwe li naw (nav) çeperê diyar kiriye.

Bişarê Çeto derbega (derb) giran li E'mê Gozê dayiye.

Belê E'mê Gozê xençer li kalanî deraniye.

Hêrşekê bo ser Bişarê Çeto birriye.

Daye ber xençeran belê xençer kar li BiEQ \O(s,,)arî nekiriye.

Çunkî ew e serê çend rojane E'mê yî çî xarin nexariye,

xulamê Bişarî, E'mê Gozê dikuştiye.

Xeberê E'mê Gozê bi diyê wî gehiştîye.

Lez kir û lezandiye, xwe bi meytê wî gehandiye.

Dît birîna wî li sîngê ye, ji gerdenê azad kiriye.

Gozê dayîka E'mê cilkeka mêraniyê li ber xwe kiriye.

Gazî diket Bişarê Çeto:

Ewê hingo kuştî E'mê Gozê niye.

We'z E'mê Gozê me, kurê Pîrê me,

beranê mala Seydo me,

Sîto me, tornê mala Şero me.

Wextê guhê wan li wî dengê dibiye.

Destê wan li ser darê tivingê dilerziye.

Herêk bi hêlê, piya meydan bi cî hêştiye.

Leşkerê Bişarê Çeto reviyê û şikestiye.

Têbînî

(*) Ev parçe yê giranbiha ji govara Sirwe,

hejmar 40, sala 5'ê- 1990 zayînî hatiye girtin.

(1) Tîqe: Tika û hêvî.

Emîna (1)

Eman neman lê Emîna!,
Nav min û te dîwar e,
Pehnkî lêxîn werîn xwar e,
Serê memkên te zer bûne,
Alîk sêv e û yek hinar e,
Yek bihok û yek pirtiqal e,
Kerem bik' were male.
Te dî li bin mêwa tirî,
Goşî bi goşî diçînî,
H'eb bi h'eb jê dikirî,
Teres li keçkê fitilî,
Lê û lê lê Emîna.

Memkên te sohr û sipî ne,
Wek fîncanê fexfûrî ne,
Wek sêvê Meletê ne,
Serê sor e kokspî ne.

B' şêx û mela t'a min î,
Tim meh'bûba l'ber vî dilî,
Te dî li pehnava reza,
Ez çûm b'rûkî sohr b'geza,
Tu b'nêr l'kolan û qeza,
Ezê gewrê birevînim,
Bibim welatê Çerkesa.
0000000000

Emîna (2)

Emîna ban kir Pêrûza,
Go: Porê serê te kur be,
Izdînê mala Temo,

Şêwir û mişawirên giran datînin,
Koma giran li ser kozik û çepelê Qeyanyatê dicivînin,
Tacdînê mala Hecî Osman ne li mal e,
Li mîrata Pêpanê, nobetê dikşîne,
Pêrûza tu rabem berê xwe bide mala Melê,
Bê: Namûs namûsa Xwedê û namûsa mêrê çê ye.
Bila kaxezekê binivîse û bibe Pêpanê,
Di destê Tacdînê mala Hecî Osman de deynê...
Bê: Namûsa Xwedê û namûsa mêrê çê ye.
Mela radibe, kaxetê dinivîse û berê xwe daye Pêpanê,
Kaxetê di destê Tacdînê mala Hecî Osman de datîne,
Gava kaxetê di destê Tacdîn de deytîne,
Tacdîn li kaxezê dinêre, aqilê wî di serî de namîne,

Ban dike peyan, dibê:

Gelî peyano! Hon (hûn) nobetê bikşînin,
Ji êvara Xwedê de, dengê wan çapliyan,
Li ser kozika Qenyatê xweş tê,
Hon (hûn) nobetê bikşînin,
Ezê herim saxlixkî ji kozika Qenyatê hilînim.
Tacdîn radibê û dilezîne,
Hayê wî tu carî ji bayê felekê tu nîne,
Izdîne mala Temo Gewrê şêwir û mişawirên giran datîne,
Sê kemîna li pêşiya Tacdînê mala Hecî Osman deytîne,
Tacdînê mala Hecî Osman tê û dilezîne,
Dikeve nav her sê kemînan,
Her sê kemîn lê diteqînin,
Destê xwe davê ser xencerê,
Her sê kemîna bi xencerê dişkênîne,
Xwe bi darê xencerê dikişîne,
Kozika jorî, di kozikê de rûdinê...
Izdîne mala Temo ban dikê, dibê:

Tacdîno! Tu a min bikî, tu ê rabî, Ji kozika Qenyatê bêxwîne û
tu ranebî, Wa'dê Xwedê li canê min keti be, Ezê vê sibehê ruhê te
bistînim.

Tacdîn ban kiriyê, go: Izdînê mala Temo!,

Ez kekê Izdîn û Bedredîn im,

Ez gurekî ji gurên zozana devbixwîn im,

Ezê heyvanê we ji dinê biqelînim.

Smaîlê Mihemed ban dikirî digo:

Xalo! Tacdîno! Tu a min bikî,

Tu rabî ji kozika Qenyatê, bê xwîn e...

Tacdîn ban dikiriyê digot:

Smaîlê Mihemed !

Bi şêxê Mihemed Kerbasî....

Bi Keçika Bagasî!....

Hek devê te dibêjî, dilê te nabêjî!

Heke tu xwarziyê min î, ez Tacdîn im

Ez gurê zozana devbixwîn im,

Ezê car dî bikim kerxa mêra û xwînê,

Îcar dinya misilmanî ye,

Heke tu xwarziyê min î û ez xalê te me,

Tu rabî xwe berdî Qirqata jêrîn cem Hecî Bedredînê,

Belkî koma giran li ser xalê te vegeînê...

Heft eşîr,

Koma Rima û a Kosa û a Hebizbiniya û a Omeriya,

Timam li ser kozikê civiyan.

Eliyê Hezarî ban dikirî, digo:

Xalo Tacdîno, ezê pirsekê ji te re bêjim,

Ko tu bê, ji tirsê ye, ez na bêjim....

Heft eşîr hatine ser me, em rabin, emê herin....

Tacdîn ban kiriyê, go: Elî lawo!

Me heya niha, min digo: Qey tu mêrekî baş î....

Belê navê mêraniyê di nav te de nîne.

Wa'de li min keti be,

Ez navê revê bi dû mala Hesên şemdîn na xînim.

Tacdîn go: Elî lawo!

Tu rabe, dûrbînê li ber çavê xwe deynê...
Li deşta Kerbasê bimeyzînê,
Birek peya ji deşta Kerbasê tèn û dilezînin...
Ez nizamim nedost, ne dijmin in....
Gava ko wilo jê re got:

Mihemedê Hecî Ebdela got:

Lo...Lo....! Tacdîno!

Wa'dê Xwedê li min keti be,
Heke Xwedê rûhê te nestînê,
Ezê îro rûhê te bistînim.

Tacdîn ban dikiriyê digo: Mihemedê Hecî Ebdela,
Ne hewceyê zirta û forta ye!....

Nayê Bîra te roja ko tu li deşta Kerbasiyan bû,
û ez û tu li hev rast hatin,

Tu bi sî peyê ve û ez bi tenê bûm û min berda dû te,

Û min deh zelumên te kuştin,

Û min tu heya nav malê Kerbasiya birin.

Îro hon heft eşîr in û ez bi tenê me, piraniyê mêranî daniye,

Belê ezê çî bikim...

Eşîr lê hatine hevdu û hema tivingên xwe lê rast kirin,

derbek lê xistin; hina rûh tê hebû; ban kir xwarziyê xwe **Eliyê Hezarî**,
go:

Lawo! Rahîşt tifinga min, xeyra min ne maye,

wê te jî bikujin, **Elî** rabû û dî ko xeyra wî nemaye, xwe di kozikê re
avêt nav peyan,

peya ji ber bûn du alî, go qey **Tacdîn** e. Tifinga wî xelas kir û ew jî
xelas bû.

Tacdîn tu xweş xelas bû.

Emîne (3)

Emîne bûka salê,

Te kinkê bi fesalê,

Çavreşê, çavxezalê,

Eman n'ma lê Emîna.

T'xwediya teşî glokê,
Tak rêhana ber bihokê,
Bihna t' bihna şimamokê,
Ez l' cem rakim şev û rokê,
Ez têr nabim ji vê gilokê.

Ev sibe ye, berxa kiş kê,
Xilxalê te bi xiş xiş kê,
Ev sibe ye, berxa berde
Mêrê xerab kul û derd e.

Jina pîs t'laq d'dest de,

Ti b' kêr nayî, were m' berde,
T' mîna nîzka nekelî,
T' mîna nîzka serê sibehê,
Çar tiliya av di ser de....

Emîn o !

Ha wer werê, wer werê, werê Emîn o !
Nav û gerden çî şêrîn o!
Emîn o! Min û çema, çemê Bişêriyê,
Mi dî kelevana kelek berda li dû gemiyê,
Xwezî bi wê gavê û bi wê kêliyê,
Baqê temberiyê bikî, hevalê vê keziyê...
Emîn o! Ez bi çema ketim, çemê Bişêriyê,
Emîn o! Were min birevîne,
Bavê koçika Geydûkê, bavê ser darê wê hewiyê,
Emîn o! Ez bi Bişêriya xopan ketim, li ber avê,
Mi dî siwar û peya dabûn navê,
Xwedê tea'la min û Emînê Eh'med bisitirînê ji weynê jinbavê,
Emîn o! Min û çema ketin, çemê Bişêriyê,

Xwezî wexta kolos xwar be ser kofiyê,
bi çepî min bigrî, bavêjî ser hewiyê....

Êmo! (1)

Êmo, Êmo, Êmûşê!,
Koçera j'deşta Mûşê,
Dew tune rûn difiroşê,

Heçî xwaka wan pak e,
Ez û wan destbirak e,
Heçî xwîşka wan reş e,
Ez û wan pev ne xweş e,
Li ber çavê min reş e.

Êmo hat û meşiya,
Kil li çava weşiya,
Ez ketim dilim êşiya.

Êmo hat û xwe l'ba kir,
Bejna zirav du ta kir,
Sê biskê sor hena kir.

Êmo, Êmo, Êmûşê!,
Lawik bavê dergûşê,
Ezê b' çepî te bigrim,
Bavêjim deşta Mûşê.

Êmo bû, çû kaniyê,
şara reş ket eniyê,
Sola sor ket pehniyê,
Ez xulam deqa l'eniyê.

Êmo! (2)

Hey Êmo, Êmo, Êmo,

Tu here w'ez bibêmo,
Êmo li binya tehtika,
Xweş ji mastê elbika.

Memkê xwe li devê mi ke,
Xwedê te bi rizqê mi ke,
Êmo keçika keşe ye,
Paşil tijê xurme ye.

Êmo li binya xaniya,
Memkê Êmo mi diya,
Xweş e ji goştê kêviya,
Hey Êmo, Êmo, Êmo.

Êmit, Êmo, Êmoşê,
Dev (dew) tune, rûn difiroşê,
Mêr tune, kur li koşê,
Koçera deşta Mûşê.

Êmo d'hat û d'gulgulî,
Eynik danî û xemilî,
I' bejnê paçikê gulî,
Xeftan I' bejnê edilî,
B' şêx û mela t'ya min î,
Mehbûba I'ber vî dilî.

Êmo, Êmo, Êmoşê,
Êmo dî li banê banî,
Tu b'xizêmek ridwanî,
A ko mi digo te anî,
Sed bimbarek li wî canî.

Erebşênê !

Mi dî bejna zirav ji avê tê,
Bihna misk û e'nber û darçûna ji ber piştê tê,
Mi ji te re nego:

Were bîstkê li teniştê min rûnê,
Emê bikin kêf û helakêr û naqirdiyê darê dinê,
Mirina malxirab bi bîra kê tê....
Bejna te zirav e, takê rêhanê,
Şîn dibû li Tizyana şewitî, li pîkê heywanê, (eywanê)
Şan û şîna mala Fendî axa li binya malê,
Heke qatî nebû miradê dila û wezê bejna zirav birevînim,
Emê xwe bavên bext û ocaxê bavê Kamil,
Dila sala vê salê, di ber me de bidê hersê qîstê dêmanê,
Ber derîkî mala bavê min bê sergo ye,
Kûçikê Kanos gelekî no ye,
Xera fikir civanê hero ye,
Mi dî bihar hatî, çaxê kerengvaniya,
Xwezla mi bi wê gavê, wê sae'tê,
ku min cihê xwe û bejna zirav,
li banê bilind tevde daniya,
Gava mamûrê firara bi derketana nav Omeriya,
Minê navê xelkê delal, ji çîtika ses hilaniya...
O, lo kuro....!
Derî veke were hinduro!,
Xwezî bi gava ku serê min û te here ser behlîfê,
Tu bê keçê û ez bê (bêm) kuro!
Mi dî bihar hatî dilaxêvê,
Payîz hatî çaxê dilketin û kêfê,
Kêf û henek xweşin, li ser xaniya, li bin lihêfê....

Evdal Omer

(Ji berhevoka Socin û Prym – Petersburg 1887, li Zaxoyê hatiye bihîstin û nivisandin) (Tîpguhastin : Cankurd)

Çi subehiyêke zû ye
Evdal xewneg (xewnek) dî tiye
Çil sala xezayî ye
Evdal Omer e, mîro, jimbabê (jinbabê) Evdalo tu ye
Tu tufalî, tufalekî mendalî (şagir)
Tu li şûna mamê Alî

Got : Jimbabê, ez ne tufalim
Ne tufalekî mendalim
Go : Evdalo da pikî (bikî) li tegbîr e
Vê xewnê bike ji bîre
Em dê Evdal kîne (bikine) mîr e
Go: Jimbabê, ez nakim tegbîr e
Va xewnê nakim ji bîre
Evdal bi xwe navêd (navêt) mîr e
Go: Evdalo, da piçin (biçin) zozana
Da em bixun goştê berxane
Vexun avêt (avêd) kevyane
Henekê bikin li gel kîjê (qîzê) gewrane
Go: Jimbabê ez naçim zozana
Ez venaxum avê kevyane
Naxum goştê berxan e
Li min h'eram bid nezerê kîjê (qîzê) di gewrane
Heta xezayê nekim çil salan e.
Go: De kar kin, kar kin
Dewara pêş û paj (paş) nalkin
Extiyara (extiyaraniyê) çil sala kin
Ve Evdal mîrek tamam e
Esker rakir xas û a'm e
Xudbe (xutbe) ve biriye Şam e
Evdalo kesê dayê
Xwedê dewled (dewlet) ve dayê
Ji Şamê ve gerhat terefê Bexdayê
Evdal mîrekê çê ye
Esker berda deştê ye
Standî welatê Romê ye
Evdal mîreg (mîrek) biçûk e
Esker rakir ji Gerdûk e
Standin Silêmanî û Koy û Kerkûk e
Evdal mîrek tamam e
Eskera xas û a'm e
Xudbe ve birî (ye) Şam e
Evdalê mi hêş kur e

Tifinga guregur e
Bi şîr (şûr) hat, standî Navkur e (bê:bi)
Evdal mîreg (ek) bi xezeb e
Esker rakir ji Ereb e
Şîr standî girê Mi'heme Ereb e
Evdal mîrekî sil e
Eskera bû sinsil e
Bi şîr vî standî Mûsil e
Evdal mîrek tamam e
Eskera xas û a'm e
Xudbe ve birî Şam e
Evdalê min î sîs e (sor û zer e)
Eskera xîsexîs e
Bi şîr çû bi Sêrt û Bedlîs e...
Hey hanê sed car hanê
Xulamê dikim cedîdanê
Bi şîr çû bî (bû) behra Wanê
Evdal mîrek tamam e
Eskera xas û a'm e
Xudbe ve birî Şam e
Evdalê min xweş mîr e
Esker rakir pi (bi) tegbîr e
Bi şîr ve standî Cizîr e
Evdal got xulama here
Eskere had (hat) beramber e
Bi şîr standiye Şax û Hewlêr e
Evdal mîrek tamam e
Eskera xas û a'm e
Xudbe ve birî Şam e
Ey hoyê sed car hoyê
Xulamê dikîne goyê
Bi şîr ve standî Zaxoyê
Çi subeyeke hîn e
Esker qewî ceme' bîne (bûne)
Bîst û çar hezar tamam bûne
Bi şîr standî welatê Behdîn e

Evdalê min î çê ye
Esker berda deştê ye
Bi şîr standin Şoş û Akrê ye
Evdal kurê jinebî ye
Suwarê li ma'negî ye
Bi şîr standî Amêdiye
Got: Xwedê xerab bikit gelyê Nûhêyo
Kafirê kore (bi kore) lêyo
Tirsa Evdalî jêyo
Evdalî got: here kafiro eskerê te çende (çine)
Kafirî gotê: Eskerê min çil qeşe ne, çil ebobe ne
Têrê eskerê Evdalî hene
Kafirê kor e ve rabûye
Gazî keça xwe kiriye
Go: Ya kiçê û ya keçîne
Tîr li kevanî bîne
Da bavêjim Evdalê Nûrîn e
Keçik vê rabûye
Tîr û kevan îrandiye
Tîr pi (bi) çepî li kevanê suwar kiriye
Bi destê babe îrandiye
Go: Kiça dî ji wê ve hatiye
Gazî babê xwe kiriye
Go: Babo, te hêj tîra xwe ne avêtiye?
Tîr pi (bi) çepî suwar kiriye
Keça dî haj Evdalî kiriye
Evê ne divye kuştina wî ye
Kafirî tîra xwe wergerandiye
Tîra xwe serêk (serrast) kiriye
Hespê Evdalî nêr e
Li pê tewla ve tikit (dikit) gêr e
Vê şevê Evdalî tamam bû mêr e
Evdalî subehî zû rabûye
Kar û barê xwe kiriye
Tabûra eskerê ve girtiye
Pêj (pêş) miqabilî kafirî sekiniye

Evdal pi (bi) xwe vê suwar bûye
Li pê eskerî çûye
Li ser birkê sekiniye
Evdal cilê xwe êxistiye
Cinabetî lê ketiye
Xwe di birka avê hilaniye
Evdal ji birkê derketiye
Xulama cil jê re girtiye
Evdal cilê xwe wergirtiye
Hespî jê re aniye
Serê hespî jê re girtiye
Evdal suwar bûye
Li pê tabûra eskerê ketiye
Serê gelî ve girtiye
Pêj (pêş) miqabilî kafirî ketiye
Qîrên bi kafira ketiye
Go: Evdal cihê me girtiye
Keçkê gazî li bavê kiriye
God (got): Babo, me hêj ti esker ne dîtiye
Go: Keça min, tîr li kevanê suwar kiriye
Min dengê Evdalî ne bihîstiye (bihîstiye)
Go: Keçka min, çil salê di Evdal temam bûye
Kafirê kor e vê rabûye
Go tîra xwe avêtiye
Çûn û hatina wî ye
Bîst û çar sae'ta tîr sekiniye
Bîst û çar sae'ta çûn û hatina wî ye
Wekî tîr bi xwar ketiye
Bi Evdalî ketiye
Derhal Evdal miriye
Temam bûye
Go: Sube ye çi subeyekê zû ye
Qîrên bi eskerî ketiye
Li eskerê bû gaziye
Eskerê jig (ji êk) pijikiye (pijikiye)
Evdal li cih da hiştiye

Çi subeyeke li hîndav e
Li eskera bî (bû) belav e
Evdal hêla bû li nav e
Ciwab çû jimbabê
Go: Hanê sed car hanê
Xulamê dikin cidîdanê
Xulam hatin li baxvê (baxçê) kanê
Jimbabê god (got): Ji vê taxê heta taxê
Ez pê bidim heşê û zaxê
Xulam hatin kanê baxê...

Evdo...! (1)

Evdo de menal, Evdo de menal...
Gava ku dengê nalîna tê te (tê ji te),
Qet hêvî û tebata min nayê,
Ezê ji heybetê te re dikevim tayê...
Mi dî Evdê E'î bi sê dangan ban dikirî (bang dikirî),
Emîşê dayê û Hesine lawo! û Xaco porkurê,
hûnê daw û derlingên xwe hilkin û bilezînin,
Bi serê xanîk û xidûra şewitî kevin,
Sê denga li Mûsayê Silo, axayê xorta,
Bikin hawar û gazî bîn:
Silav û kilama Evdê E'î,
Bavê şakir li te hene...
Binêr bê hawarkê ji me re naşîne,
Her çar malên Xerabzinya şewitî,
Bi Evdê E'î re û Silo yê bira re xaîn in,
Gava ku Emîşê di ser xanîk û xidûra şewitî kevin,
Sê dangan li Mûsayê Silo dikin, hawar û gazî...
Mûsa yê Silo dibêje E'mîşê dayê !
Here silavê min, li ser Evdê E'î,
bavê şakir gelek hene,
Tembiya min lê be,
Bila derba xwe li mêrê hikûmetê nexîne,
Pêşiya hikûmetê zirav e, dawiya wê stûr e,
Tu îmkana me bi mêrê hikûmetê tu nîne,

Gava ku E'mîşê tê, ji lawê xwe Evdo re dibêjê:
Ti ronahî li çavê Evdo namîne,
Mi dî Siloyê bira bang dikirî,
Keko Evdo !, tu serê xwe li ser kozikê,
Li ser çeperê biderînî,
Li birînê kekê xwe, Siloyê bira bimeyzînî...
Gava ku Evdê E'lî li birînê kekê xwe,
Siloyê bira dimeyzînê,
Paketê li newqa niqtaliyê nizamî dixînê,
Li ser Sebrî başçawîşê nizamî deytînê,
Sebrî başçawîşê nizamî,
Ji ser piştê hespê diqulbînê,
Berê niqtaliyê vedigerînê,
Li ser Mih'emed Letîfê Hestilî deytînê,
Li rehnê rastê dicînê,
Di newqa şinbozê re difirînê...
Evdê E'lî radibe ku here tifinga wî ji xwe re bînê,
Mih'emed Letîfê Hêstilî mêrê namûs û xeyretê,
Destê xwe davê qundaxa mawzerê,
Bi ber xwe tînê,
Li ser Evdê E'lî, bavê şakir deytînê,
Li çîçka rastê dixînê,
Di riha mixasiyê re difirînê...
Hewar e, sê carî hewar e...
Evdê E'lî kuştî ye, Silo yê bira,
Bi sê gulan birîndar e,
Her çar malên Xerabzinya şewitî,
Bi Evdê E'lî re û Silo yê bira re,
Dijmin û neyar e,
Li ser Evdê E'lî û Siloyê bira rabûye, e'sker û ferman e.

Têbînî:

(1): binêr rojnameya Roja Nû, di navbera
salên 1943 û 1946'an de, Beyrût - Lubnan.

Eyşanê.....!

(Binêr: **Delalê Eyšê**, hej. 7 **Hawar** 199.7: Vegere li lêkolîna **Dr. Husên Hebeş** li ser kovara Hawarê, rûpel 149-150)

De lê lê Eyšanê ! de lê lê Eyšanê !

Destê xwe ser sînga te bigerînim,

Li dinya yê weke te ez nabînim...

De lê lê Eyšanê ! de lê lê Eyšanê !

Ezê (1) tembûrek çêkim, çarde perda,

Ezê têla bêximê ji kula, ji derda,

Jinê delal ji mêrê kotî,

Mêrê delal ji jinê kotî,

natê kuştin û natê (2) berdan...

De lê lê Eyšanê ! de lê lê Eyšanê !

Ezê tembûrek çêkim ji hesto ê mara,

Ezê têla bêximê ji biskê yara,

Ezê devê xwe deynim li bin guhê guhara...

De lê lê Eyšanê ! de lê lê Eyšanê !

Ezê tembûrek çêkim ji hestoê çûka,

Ezê têla bêximê ji biska bûka,

Niha ez nazewicim, dostê me piçûke...

De lê lê Eyšanê ! li min û li vî dilî, li min û li vî dilî !

Bejna te kulîlka nû xemilî (3),

Dê û bavê te ser min û te çûne gilî,

Lê lê li minê, lê lê li minê...

Terkê (4) te nadim hetta xerîna mirinê,

Ez têr bûme ji vê gohtinê (gotinê)...

Têbînî yên (Socin û Prym):

(1) wezê (2) bê (û) (3) kemilî (4) terka

Eyşê

Mala te sergo ye,
Eyşê dêranê,
Mêrê te zaro ye,
Eyşê dêranê,
Bavê te mûro ye,
Eyşê dêranê,
Tiyê te hûro ye,
Eyşê dêranê,
Mala te bilind e,
Eyşê dêranê,
Jê pê ket mêm û find e,
Tu rebena gund e,
Eyşê dêranê,
Mala te li nav mala,
Eyşê dêranê,
Katib bi qurbanê,
Eyşê dêranê.

Ji stranên **Tor Abdîn**

Civandin, derxistin û wergerandin bo Almanî: **EUGEN PRYM** û **ALBERT SOCIN**, St.- Pétersbourg, 1887[Tîpguhastin: **Cankurd**]

"**Ezdîn Şêr** li ba **Sosin û Prym** -1887 bi du şêweyan hatiye nivîsandin, carekê ji devzarê dengbêj **Cano** û carekê ji devzarê dengbêj **Pînehasê** ku cihoyekî (yehûdiyekî) Zaxokê bû, hatiye girtin."

Ezdîn Şêr

I

ji devzara Cano:

Ew Dêrgulê, xweş Dêrgulê,
Mala Ezdîn Şêr û mala Meşûr beg (1) birin Mûsilê,
Dilê min (2) dadiye,
Sleyman axa Qereçolî, (3)
Ji bajara Bexdayê me'zûl kirin, hatiye,

Şevêkê li mala Ezdîn Şêr mayî ye (4),
Ezdîn Şêr gotiye,
Go tu ji çira hatiye?!,
Go paşa mi mee'zûl kiriye,
Şewr û qewlê xwe daniye,
Rabûn piya,
Go bejna mîrê mi ji bejna roye (5),
Suwar dibûn (6) ser hespê şev û ro tajoje (7),
Berê xwe dan Zaxo ye,
Go ew Zaxoyê bi rût kevota,
Beyraq bûne cot bi cota,
Berê xwe dan Cizîrê Bota,
Axa çûne, wezîro ! çûne,
Li odakê (8) Brahîmê Miho peya dibûne,
Ezdîn (9) Şêr go Brahîmê Miho:
Axlerê Cizîrê ji mi ra bicivîne,
Brahîmê Miho radibiye (10),

Axlerê Cizîrê civandiye,
Li dîwanê Ezdîn Şêr kom kiriye,
Gotin go mîrê min h'alê hevalê te çiyê ?,
Go odakê Brahîmê Miho li ser bêndera,
E'skerkî giran bicivînin ji mi ra (11),
Ezê herim Bexdayê ber gawira ser seferê,
Weke ulo (12) got Ezdîn Şêr,
Brahîmê Miho lê vegerand go em we nakin,
Emê seferê betal kin,
Lê emê romiyê kimsahr (komsor: qizilbaş) ji vir (13)rakin,
Go mîro ! em dibînin, dibînin,
Emê romiyê kimsahr ji vir hilînin,
Emê hukmê xwe ê Bota ti şûnê (14) wa dînin (15),
Mîrê min go rabin piya,
Dem herin (16) serayê,
Em (17) serjê bikin midûr û pevlî (18) romiya,
Erê weke mîrê min we gotiye,
Didu ji meclîsê qebûl nekiriye,

Ezdîn Şêr go çima, çima ? (19),
Gotin, go mîro! qesra Brahîmê Miho li ser bênderê,
Te karê xwe kir, tu herê seferê,
Emê (20) newêrin şerê romiya bikin,
wê lawê me bixin e'kerê,
Ezdîn Şêr radibiye,
Herdu li meclîsê kuştiye,
Kire çolbê sera yê romiye,
Midûr reviyê,
Sê romî li serayê kuştiye,
Kaxezek nivîsiye,
Di nav welat bela kiriye,
E'skerik qewî civandiye,

Da şewr û qewlê xwe daniye,
E'sker bi nivî kiriye,
Ezdîn Şêr û Sleyman axa pi çema (21) Têlanê çuye,
Meşûr begê bialiyê Mîdyadê hatiye,
Mîro li wê rexê, li wê rexê,
Meşûr beg berê xwe da Hezexê,
Axa dibêjê (22),
Meşûr beg berê xwe da Medêhê,
Mîro tu dibînê,
Peya dibû li Basbirînê,
Mîrê me radibû, suwar bû li qemerê,
Peya dibû li Dêr E'merê,
Mîro de rabe ba tê, ba tê,
Meşûr beg berê xwe da Mîdyadê,
Weke mîrê min hatiye,
Mîdyadê bi derbekê reviyê,
Malê Mîdyadê talan kiriye,
Hukmê xwe li bajara Mîdyadê daniye,
Sê roja li Mîdyadê mayî ye,
Ezdîn Şêr û Sleyman axa ji çemê (23) Têlanê rabûn piye,
Berê xwe da (24) bi baskê Mîdyadê hatiye,
Pevlî (tev li) e'skerê hatiye,

Ew jî li Mîdyadê peya bûye,
Şewr û qewlê xwe daniye,
Meşûr beg go kekê tu dibînê,
Wee'da bê li canê min ketibê,
Ezê ji vê derê çim (biçim) deriyê Mêrdînê,
Dilê min dadiye, dilê min dadiye,
Wekê Meşûr begê wa gotiye,
Kaxezik ji wa ra hatiye,
Go werin vegerin maliye (25),

Lê hecî Sleyman axa û Qewqalî Dêrûnê zeft kiriye,
Ezdîn Şêr (û) Meşûr beg vegeriyan,
Ezdîn Şêr û Meşûr beg rabûn piyan,
Bi (26) baskê mal da çûyan,
Pevlî e'skerê pi (bi) ser Dêrûnê meEQ \O(s,,)iyan,
Ezdîn Şêr û Meşûr begê rabûn piya,
E'sker gellik ji Bohtiya civandiye,
Ezdîn Şêr û Meşûr beg dikin şerê romiya,
Hecî Sleyman axa rabû piya,
Ew û Qewqalî rabûn piya,
Xeberê xwe pev gotiye,
E'skerê Bohta telifandiye,
Qewqalî bextê xwe ji Ezdîn Şêr dayiye,
Hetta Ezdîn Şêr û Meşûr beg hatiye,
Erê Hecî Sleyman axa bextê xwe xe ra kiriye,
Ezdîn Şêr û Meşûr beg girtiye,
Bi axa Stambûlê şandiye,
E'skerê romiya ket pişt e'skerê Bohtiya,
Were cakê bê Xwediya,
Tu nikarê bimeşê ji laşê kuştiya,
E'skerê Bohtiya batmîş bûye,
Zerîfê jinê Balyozê Mûsilê dostê wî ye dagiriye....

Têbînî (I):

(1) Mezûr begê.

(2) dilêm.

- (3) Qereçoliya.
- (4) maye.
- (5) Bejna Ezdîn Şêr bejna rokê.
- (6) dibûne.
- (7) dajon.
- (8) odaka.
- (9) Erê Ezdîn.
- (10) dibê.
- (11) ji mira.
- (12) wilo.
- (13) ji vê.
- (14) di şûnê.
- (15) dayînin.
- (16) de emê herne.
- (17) emê.
- (18) pev li.
- (19) çiyê, çiyê.
- (20) em.
- (21) bialiyê Têlanê.
- (22) dibêhe.
- (23) Ji Têlanê.
- (24) bi baskê Mîdyadê.
- (25) mala.
- (26) ew bi baskê.

II

Ji devzara Pînehasê ciho:

Ew E'hmed tegbîr (tekbîr) kiriye,
Axa yê Sor vê kuştiye,
Li Şernaxê vê asê biye,
Bi gel romiya xayîn biye,
Mala Sadiq vêra biye,
E'skerê xwe îradiye,
Li ber Şernaxê vê daniye,
Ew E'hmê lê derketiye,

Mala sadiq şikandiye,
Heta Cizîrê reviyê,
Zexîre ji wî standiye,
Mala Sadiq vêra biye,
Kaxezek pê nivîsiye,
Bo Misalmê Zaxoyê şandiye,
E'skerik ji wî xwestiye,
Misalm Zaxoyê rabiye,
Şemdîn axa virêkiriye,
E'skerê xwe wî biriye,
Li ber Şernaxê wî daniye,
Şer gel E'hmê wî kiriye,
E'hmê li Şernaxê asê biye,
Ew xweş mêre E'hmed axa,
Go aferîn bi Şemdîn axa,
Şemdîn axa vêra biye,
Kaxezek bê nivîsiye,
Bo Osman paşa şandiye,
Osman paşa wê xwendiyê,

Osman paşa ji Mêrdînê ve hatiye,
Îna E'skerê romiye,
Du topa di gel xweaniye,
Ber Şernaxê ve daniye,
Şer gel Şernaxê kiriye,
Şernaxê xirab kiriye,
Ew E'hmê ji wêrê reviyê,
Çû ketî gel yê Goyî ye,
Osman paşa vê rabûye,
E'skerê xwe wê boriye,
Li Dosta Alto ordî bûye,
Şer kirî li gel yê Goyî ye,
Gel yê Goya asê bûye,
Kaxezek bê nivîsiye,
Bo Misalmê Zaxoyê şandiye,
E'skerek ji wî xwestiye,

Misalmê Zaxoyê çûye,
E'skerê xwe bo biriye,
Ew jî dê çît (dê biçît) ser Goyî ye,
Li Şirnaşê asê biye,
Misalm kaxeza wî nivîsiye,
Bo Şemdîn axa şandiye,
E'skerik ji wî xwestiye,
Şemdîn axa vê rabûye,
E'skerê xwe kom kiriye,
Gel E'skerê lê fekiye,
Yaqûbaxa di gel çûye,
Li Şirnaşê vê peya bûye,
Li ser konaxa (qonaxa) ordî bûye,
Sir hatî e'skerê Goyî Sindiye,
Yaqûb axa vir reviyê,

E'sker bi dû wan ketiye,
Misalmê Zaxoyê li Gevşê kuştiye,
Şemdîn axa ziviriye,
Hatî bi subehî zûye,
Li Zaxoyê peya bûye,
Mizgîna Misalmî bi Zaxo bo wî hatiye,
Kurtakik mizgîn dayiye,
Şemdîn axa suwar buye,
Buqça ya bi gel xwe biriye,
Ew ber suwara ve ketiye,
Ji pêş Misalmî Şernaxê aniye,
Şêx Elî wî veşartiye,
Go nama bi Husên biga,
Şemdîn axa vê rabûye,
Kaxezek wî nivîsiye,
Bo Osman paşa şandiye,
Osman paşa wê xwendiyê,
Kaxez bedil kiriye,
Bo Şemdîn axa şandiye,
Zaxoyê teslîm kiriye,

şer kirî li gelyê Goyî ye,
Topxana wî kişandîye,
Ew E'hmê ji wêrê revîye,
Çû leg (nik) mîrê Berwariye,
Goya mutîî' (serçemandî) kiriye,
Diravê xwe qebûl kiriye,
Rehîn wî girtin ji goyî ye,
Ji Sitar Goya ziviriye,
Libê Sîpanê ordî biye,
Cewab şandî bo Zaxo ye,
Kar û barê wî kiriye,

Zexîre bo kom kiriye,
Osman paşa vê hatiye,
Îna e'skerê romiye,
Zaxoyê ordî girtiye,
E'skerê xwe dakirî Xanê çûye,
Go namînit Osman paşa,
Vê digirhit şer û gengaşa,
Li Goy şere, temaşa,
Ezdîn Şêr tegbîr (tekbîr) kiriye,
Ji Mûsilê derketiye,
Ew bo seferê hatiye,
Li nav Dîna peya bûye,
Şevêkê li wêrê mayiye,
Ew rabû subehî zû ye,
Ji Xabûrê verêkiriye,
Li Cizîrê vê peya bûye,
Maqûlê di Bohta dîtiye,
Tegbîra xwe pê kiriye,
E'sker bi xwe kom kiriye,
Gazî ehlê şorê kiriye,
Alîg bi xwe jê xwestiye,
Ehlê şorê mana bûye,
Go xweş mîr e, Ezdîn Şêr e,
Vê digirhit karkaş û gêre,

Ezdîn Şêr tegbîr (tekbîr) kiriye,
Ew rabû subehî zûye,
E'skerê xwe vê boriye,
Burca Belek vê standiye,
Gazî ehlê şorê kiriye,,
Çar mêra vê jê kuştiye,
Mala Sadiq talan kiriye,

Bîst sebedê zêra ji mala Sadiq biriye,
Ezdîn Şêr dibêd (dibêt) ez we nakim,
Tancê romê qebûl nakim,
Ez dê Romiya xelaz kim,
Ezdîn Şêr tegbîr kiriye,
Ji Cizîrê derketiye,
E'skerê Bohta aniye,
Qereçoxlî di gel hatiye,
Pênsed suwarê romiye,
Qesda Zaxoyê kiriye,
Ber Hizilî peya bûya,
Tegbîra xwe vê kiriye,
Qereçoxlî vê gotiye,
Go ya mîro xema min rexê Kestaye,
Ezdîn Şêr vê suwar bûye,
Li Xaburî ve derbaz bûye,
Bi ser Bêdarê dagirtiye,
Ji Bêdarê wêrê bûye,
hatî subehê zû ye,
Ber Zaxoyê ordî bûye,
Şer gel Zaxoyê kiriye,
Şemdîn axa suwar bûye,
Digerhit qolanê co ye (cihoye),
Xeber vî gote romiye,
Romiya suwar bûye,
Şemdîn axa derbaz bî li Borê Kestaye ,
Qereçoxlî vê dîtiye,
Bêraq ser nişîv kiriye,

Ew di gel Bohta xayîm (xayîn) bûye,
Şemdîn axa ziviriye,
Li Borê qesrê derbaz bûye,

Bi dûv ket e'skerê romiye,
Osman paşa vê fikiriye,
Vî topek suwar kiriye,
Nav qebrê Kirmanca li dev Ezdîn Şêr dayiye,
Kêlik yê pi (bi) topê firiye,
Ezdîn Şêr ji ber reviyê,
Berê xwe dabî geliye,
Şemdîn axa bi xwar çûyî ye,
Bi dûv ket E'skerê romiye,
Li Furakê (Furatê!) vê derbaz bûye,
Qereçoxlî jêl (jêr!) hatiye,
Wan qîrek li Bohta kiriye,
Wan Bohta belav kiriye,
Wê gehîştî lê li pêş qebrê coye (ciho ye),
Sed mêra ji Bohta kuştiye,
Sêsed mêra jê girtiye,
Wan hemî yexsîr kiriye,
Bo Osman paşa aniye,
Ezdîn Şêrî vê reviyê,
Şemdîn axa bi dûv ketiye,
Heta cem Kurkê coyî (yehûdî) ye,
Şemdîn axa ziviriye,
Li ber qesrê wê peya bûye,
Destê Osman paşa pê hatiye,
Go amfrîn (aferîn) Şemdîn axa,
Nemînid Osman paşa,
Wê digirhid şer û gengaşa,
Zaxo yê şera û temaşa,
Qereçoxlî bi xar çûye,
Vî suwarêd xwe biriye,
Li Cizîrê derketiye,

Pêşabûrê (Fîşxapûr) derbaz bûye,
Ezdîn Şêrî vê reviyê,
E'skerê xwe vê biriye,
Li Cizîrê hisar (damedor) girtiye,
Romî Cizîrê derketiye,
Osman paşa vê rabûye,
Şemdîn axa verêkiriye,
Di gel çû e'skerê romiye,
Li Hîzilî vê derbaz bûye,
Li Wasedê ordî girtiye,
Ezdîn Şêrî vê rabûye,
Kaxeza bi direw nivîsiye,
Bê bextî Şemdîn axa kiriye,
Osman axa di gel Şemdînaxa xayîm (xayîn) bûye,
Osman paşa vê rabûye,
Kaxezek vê nivîsiye,
Bo Şemdîn axa şandiye,
Ji Wahsidê îradiye,
Şemdîn axa vê girtiye,
Di gel Farisê bira yê wî ye,
Gel Cume' yê Cezîrî ye,
Gel E'marê Cume'î ye,
Di gel Hasînê Hevêriye,
Gel Yaqûb axayê Sindiye,
Gel Slêman axa Tirkî çûye,
Vî qeyd û zincîr kiriye,
Kaxezek vî nivîsiye,
Bo H'elîm paşa şandiye,
E'skerek ji wî xwastiye,
H'elîm paşa wê xwendiyê,
E'sker boyî verêkiriye,

Du hezar nîzamaniye,
Du topa di gel xweaniye,
Ne (neh) filleh ordî bûye,
Zexîre bo kom kiriye,

Osman paşa vê rabûye,
Ew rabû subehî zû ye,
Ji Zaxoyê suwar bûye,
Berî e'skerê Romî ye,
Vê birin dewarê topraxê co ye (ciho ye)
Zexîre lê bar kiriye,
Li Pêşabûrê (Fişxabûrê) ordî bûye,
Kelik Pêşabûrê bestiyê,
E'skerê li kelka derbas bûye,
Çemê Xanîkê ordî bûye,
Go namirêd Osman paşa,
Vê digirhit şer û gengaşa,
Li Zaxoyê bi şer û temaşa,
Kena'n paşa vê Sêrtê hatiye,
E'skerek boş înadiye,
Qesta Cizîrê kiriye,
Ezdîn Şêr lê derketiye,
Pêşiya wî vê girtiye,
Kena'n paşa şikandiye,
Ava Teloyê derbas kiriye,
Ezdîn Şêrî vê çûyî ye,
E'skerê Bohta biriye,
Bi ser Sêrtê da girtiye,
Vî Sêrtê bo xwe standiye,
Misalmê xwe lê daniye,
Hecî Hamid axa ê Sêrtî vê kuştiye,
Ew ji Sêrtê derketiye,

E'skerê xwe vî biriye,
Ser Şêrwanê dagîrtiye,
Şêrwanê mitûh (serçemandî) kiriye,
Ji Şêrwanê vê çûyî ye,
Bi ser Zewqê da vê girtiye,
Wî Zewqê xirab kiriye,
Ezdîn Şêrî vê çûyî ye,
E'skerê xwe vê biriye,

Bi ser Ridwanê dagîrtiye,
Ridwanê xirab kiriye,
Ji Ridwanê vê çûye,
E'skerê xwe vê biriye,
Bi ser Têlanê dagîrtiye,
Romiya xelas kiriye,
Ji Têlanê derketiye,
Nehêlê qut kiriye,
Ji Nehêlê vê çûye,
E'skerê xwe vê biriye,
Bi ser Midyadê dagîrtiye,
Midyadê xirab kiriye,
Ji Midyadê derketiye,
E'skerê xwe îyadiye,
Cizîrê hisar girtiye,
Şerî dikit gel romiye,
Osman paşa vê rabûye,
E'skerê xwe vê biriye,
Heft hezara tamam bûye,
Şer gel Cizîrê kiriye,
Vî topek suwar kiriye,
Melayek ser banê mizgeftê, pi (bi) topê kuştiye,
Érîş li Şurhê kêşayî ye,

Ezdîn Şêr pênc mêr kuştin ji Romî ye,
E'skerê vî ziviriye,
Li ser ordiyê peya bûye,
Go em dê Cizîrê steynîne,
Cizîrê dê talan kîne,
Osman paşa vê nekiriye,
Emir di bo (ji bo) min nehatiye,
Cizîrê talan nekîne,
Ezdîn Şêr teqbîr kiriye,
Ew rabû subehî zû ye,
Kaxezek vî nivîsiye,
Bo Osman paşa şandiye,

Osman paşa bertîl kiriye,
Ji ber Cizîrê bar kiriye,
Birî E'skerê Romî ye,
Li Celagayê ordî bûye,
Kêfa Ezdîn Şêr pê hatiye,
Ezdîn Şêr teqbîr kiriye,
E'skerê Bohta şandiyê,
Mensûr beg vê barketiye,
Qesda Zaxoyê kiriye,
Zaxoyî ji ber reviyê,
Mensûr begê vê hatiye,
E'skerek boş înadiye,
Li ber Zaxoyê ordî bûye,
Şer gel Zaxoyê kiriye,
Derh'al Zaxoyê standiyê,
Bakîr beg li qesrê asê bûye
Derbo êk (yek) ji Bohta kuştiye,
Ew xweş mêre, Bakîr bege,
Ew çî muslimig (muslimek) bi xezebe,

Çê bû Mhemedê Elî Gozila,
Ewê rûniştî li ber çapira,
Vî ewil kuştî bêraqdira,
Mih'emed bêm Dostikî ye,
Li qesrê Zaxoyê asê buye,
Derbo êk (yek) ji Bohta kuştiye,
Çî xweş mêre Mih'emed e,
Ew çî mêreke pi (bi) heybete,
Ji hemiya vî nav di xwe de,
Ti (çî) navê vî derketiye,
Hat e'skerê Zêbarî ye,
Şêlka gel Bohta kiriye,
Hawar li Bohta derketiye,
Mensûr beg vê suwar bûye,
Dengê li E'skerê xwe kiriye,
Li Celalî vê derbaz bûye,

Çû bi şerê Zêbarî ye,
Şer kirî digel Zêbarî ye,
Sê cara ji ber wan şikestiye,
Ew Eh'mê ji wê ve hatiye,
Bi destê şîrâjotiye,
Ajot koma Zêbarî ye,
Vî şikandin Zêbarî ye,
Heftîh mêra jê girtiye,
Sîh mêr jê birîndar kiriye,
Neh mêr wî jê kuştiye,
heta Pira Mazin (mezin) li dî wan çûyî ye,
Ji Pira Mazin ziviriye,
Li Zaxoyê ordî bûye,
Şer gel qesrê wî kiriye,
Bakîr beg li qesrê asê bûye,

Derbo êk ji Bohta kuştiye,
Çi xweş mêre Bakîr bege,
Ew çî Misalmê bi xezebe,
Mensûr begê gazî Bakîr begê kiriye,
Raybextî jê xwastiye,
Şerê xwe betal kiriye,
Zaxoyê talan kiriye,
Sotî bî (şewitand bû) taxa Ciho ye,
Go namînît Mensûr bege,
Ew çî h'akime bi xezebe,
Zaxoyê pakîş (paqij) kiriye,
Deng li e'skerê xwe kiriye,
Ji Zaxoyê derketiye,
E'skerê xwe wî biriye,
Heta Meh'mediyê vî çûyî ye,
Bakîr begê ji qesrê derketiye,
Qesda Mûsilê kiriye,
Li Bêzîhê peya bûye,
Şevêkê li wêrê mayî ye,
Ew rabûyî subehî zû ye,

Ji Bêzîhê vê çûyî ye,
Li Baviya peya bûye,
Wê cemaî' (civiya) bûn Zaxoyî ye,
Tegbîra xwe vî kiriye,
Kaxezek vî nivîsiye,
Bo Şêx Tahayî vî şandiye,
Şêx Tahayî vî xwendiye,
Ew derh'al vî suwar bûye,
Li Zaxoyê peya bûye,
Misalmî vê rûniştiye,
Adil begê vê zaniye,

Adil beg vê suwar bûye,
E'skerê xwe kom kiriye,
Şemdîn axa, Şêx Taha (ji) Zaxoyê derketîne,
Rev ketî li Zaxoyî ye,
Zaxoyî ji ber reviyê,
Adil begê vê hatiye,
E'skerê xwe înadîye,
Li Zaxoyê ordî bûye,
Çi xweş mîre, Adil beg e,
Ew çî h'akim e bi xezebe,
H'ukmed (hukmet) Zaxoyê kiriye,
Diraw (dirav: pare û ceza) standî ji Sindî ye,
Diraw standî ji Golî ye,
Diraw standî ji Lêfûkî ye,
Zexîre standî ji Slêvana ye,
Go (got) çî mîre, adil beg e,
Ew çî h'akim e bi xezebe,
Matoş axa ji Mûsilê derketiye,
Dused suwar înadîye,
Li Sêmêlê ordî bûye,
Dubanê xerab kiriye,
Go nemînid Matoş axa,
Gehya (Kehya) beg ji Mûsilê derketiye,
Şemdîn axa digel hatiye,

Mîrê Şêxa digel hatiye,
Li Dehokê peya bûye,
Kaxeza nivîsiye,
Bo e'şîreta şandiye,
E'şîre kom kiriye,
E'sker li wan xeyidiye,
Ew ji Dehokê suwar bûye,

Li Sêmêlê ordî bûye,
Zexîre kom kiriye,
Şemdîn axa tegbîr kiriye,
Pênsed suwar vî biriye,
Nekûşî ziviriye,
Sê gundê Zêbarya talan kiriye,
Go amferîn (aferîn) Şemdîn axa,
Adil begê vê zaniye,
E'skerê xwe hinartiye,
Bi şev ser Kolê dagîrtiye,
Van Kolê talan kiriye,
Hawar li Xarbanûrê daketiye,
Osman axa vê hatiye,
Hawara Kolê hatiye,
Ew Bohta jê derketiye,
Qesda Zaxoyê kiriye,
Amferîn (aferîn) Osman axa,
Tahîr beg ji Bexdayê derketiye,
Ah'met paşa ji Bexdayê derketiye,
E'skerek boş înadiye,
Li ber Mûsilê ordî bûye,
Şevêkê li Mûsilê mayî ye,
Ew rabûyî subehî zû ye,
Hef (heft) topa digel xwe biriye,
Li rêya Baryê çûyî ye,
Li Çalagayê ordî bûye,
Adil begê vê zaniye,
Kaxezek vî nivîsiye,

Bo Alî begê vî şandiyê,
Alî begê vê zaniyê,
E'skerê xwe kom kiriye,

Li Hîzilî vê derbaz bûye,
Li Zaxoyê peya bûye,
Govend li Zaxoyê girtiye,
Heta nîvşevê mayî ye,
Ji nîvşev pê ve vê reviyê,
Adil beg digel xwe biriyê,
Ji Zaxoyê xilas bûye,
Li Hîzilî vê derbaz bûye,
Heta Şaxê vê çûyî ye,
Go çi mîr e, Alî beg e,
Ew çi h'akim e bi xezebe,
Vê di rabûne Zaxoyî ye,
Tegbîra xwe vê kiriye,
Kaxezek nivîsiyê,
Bo Şemdîn axa suwar bûye,
Mîrê Şêxa înadiyê,
Li Zaxoyê ordî bûye,
Şemdîn axa vê rabûyê,
Vî kaxezek nivîsiyê,
Bo Kehya begê vî şandiyê,
Kehya begê vê xwendiyê,
Ordî Sêmêlê rakiriyê,
Qesta Zaxoyê kiriyê,
Abdilrehman digel hatiye,
Di gel e'skerê Artoşî ye,
E'mer axa digel hatiye,
Digel E'skerê Dostkî ye,
Bakîr axa digel hatiye,
Di gel e'skerê Argoşî ye,
Li Zaxoyê vî ordî bûye,
Topa mezin vî biriyê,

Vî li Nûkşê ziviriye,
Vî li Zaxoyê de înadiye,
Li Zaxoyê ordî girtiye,
E'sker li Zaxoyê kom bûye,
Ezdîn Şêr tegbîr (tekbîr) kiriye,
Ji Cizîrê derketiye,
E'skerê xwe vî biriye,
E'skerê xwe hejmartiye,
Heşde hezar tamam bûye,
Ew jig (jî) diçît ser Romiye,
Vî li Dêrûnê ordî bûye,
Tehar begê vê zaniye,
Kaxezek vî nivîsiye,
Bo Ezdîn Şêrî vî şandiye,
Rayî û bextavêtiye,
Ezdîn Şêr kaxez xwendiyê,
Kaxez qebûl nekiriye,
Ewî kaxez dirrandiyê,
Tehar begê vê zaniye,
Ji ser ordiyê guhûstiyê,
Ordî bi xalî kiriye,
Topxane pi (bi) kar kiriye,
Nîzama reş pi kar kiriye,
Suwarêd xwe belav kiriye,
Sê kamûna (kanûn:top) li ber daniye,
Ezdîn Şêrî vê rabûye,
Vî şêrî xwe rûs kiriye,
Dûv e'skerê xwe ketiye,
Pi (bi) ser ordiyê dagîrtiyê,
Van ordî batmîş kiriye,
Tehar begê vê rabûye,

Topxane veresandiyê,
Van Bohta belav kiriye,
E'skerê Bohta vê şikestiyê,
Ezdîn şêrî vê reviyê,

Nîzama reş bi dûr ketiye,
Heta Cizîrê vê çûyî ye,
Şeş hezar jê tamam kiriye,
Cizîrê ji wî standiye,
Ezdîn Şêrî vê reviyê,
Pêra Cizîrê derbaz bûye,
Li Banexanê ordî bûye,
Dused mêr digel mayî ye,
Tahir begê vê hatiye,
Cizîrê zept kiriye,
Tahir begê vê rabûye,
Kaxezek nivîsiye,
Bo Kehya begê şandiye;
Ezdîn Şêr mi (min) şikandiye,
Şeş hezar jê tamam kiriye,
Şahyane li Zaxoyê girtiye,
Gotamferîn (aferîn) Tahîr bege,
Kehya begê vê rabûye,
Deng li e'skerê xwe kiriye,
Ji Zaxoyê verê bûye,
Hefthezarê vebiriye,
Qesta Cizîrê kiriye,
Nêrvanê ordî bûye,
Navroyê xerab kiriye,
Go xweş mîr e, Kehya beg e,
Şivakê (şifaqê) li vêrê mayî ye,
Ew rabûyî subehî zû ye,

Ji Nêrvanê verê bûye,
Li Banexanê ordî bûye,
Ezdîn Şêrî ji ber reviyê,
Ketî qerika geliye,
Li qerikê da asê bûye,
Kehya begê vê rabûye,
Vî kaxezek nivîsiye,
Bo Ezdîn Şêrî şandiye,

Ray û bext vîavêtiye,
Ezdîn Şêr kaxez xwendiyê,
Ji qesrikê derneketiyê,
Baweriya (baweriya) wî nehatiyê,
Balîlozek (sefîrek) vê hatiye,
Ezdîn Şêrî axiftiyê,
Baweriya wî pê hatiye,
Ew ji Qesrikê derketiyê,
Neh bar jê ra bar kiriye,
Digel balîlozî çûyê,
Qesta Mûsilê vî kiriye,
Li gemiyê vê derbaz bûyê,
Vê cemabûna ciho ye,
Kaxezek nivîsiyê,
Erzîh'alek avêtiyê,
Li ber paşayê avêtiyê,
Paşa yê kaxez xwendiyê,
Vî gazî kiriye ciho ye,
Malê wan defter kiriye,
Hefsed hezar tamam bûyê,
Li kaxezê da nivîsiyê,
Bo xûntkarî (hakim û sultan) hinartiyê,
Ezdîn Şêrî vê xwastiye,

Ji Mûsilê vê boriyê,
Stanbolê berza kiriye,
Hinda bî (bû) malê ciho ye,
Dilkê min î li ber vê rayê,
Kaxez ger hebûn dinyayê,
Em cuwê (ciho) Zaxoyê,
Kirne yexsîr, berdane dinyayê,
Çi xweş mîr e, Ezdîn Şêr e,
Bidin ber xencer û kêra,
Tiştêk bo me nehêla,
Em kirne yexsîr, berdane deşt û dêra.

Têbînî (II):

Ev parçe ya gelek giring û hêja ye, loranî têde piraniya bûyer, mirov û ciyên serhildana Ezdîn Şêr hatine nasîn û wilo em dikarin navên cî û war, şervan û dijminan, êl û çem û qadên şer, wek çawa berî niha bi sed salî û bêhtir dihatin lêvkirinê, bo xwendevanên hêja bi cih bikin:

Navên cih û warên ku di va stranê de hatine:

Banexan, Baryê, Bavya, Bexda, Bêdar, Bêzîh, Burca Belek Celaga,
Cizîr, Dehok, Dêrûn, Dîna, Duban, Dosta Alto, Geliyê Goyî, Gevşê,
Kolê, Mehmediyê, Midyad, Mêrdîn, Mûsil, Nehêl, Nêrvan, Sêmêl,
Sêrtê, Sitar Goya, Sîpan, şêxê, Şernax, Şêrwan, Têlan,
Ridwan, Wasdê, Xanê, Xarbanûr, Zaxo, Zewqê.

Navên çem û robaran:

Borê Kesta, Borê Qesrê, Furak, Hîzil, Pêşabûr, Telo, Xabûrê, Xanîkê.

Navên êlan:

Argoşî, Artoşî, Berwarî, Bohta (Bota), Celalî, Dostkî, Goya, Golî,
Kesta, Lêfûkî, Sindî, Slêvanî, Şêrwanî, Şêxa, Zêbarî.

Navên began, axan û şervanan:

Ahmed axa, axayê sor, Hecî Hamîd axa, Mato şaxa, Slêman axa,
Şemdîn axa, Yaqûb axa...

Adil beg, Alî beg, Bakîr beg, Mensûr beg, Tehar beg,
Kehya beg Şêx Elî, Şêx Taha, Ahmed paşa, Helîm paşa,
Osman paşa, Abdilrehman, Derbo, Cume yê cizîrî, Emanê Cume,
Hasînê hevîrî, E'hmê, Husên, Faris, Kurkê coyî, Qereçoxlî,
Mehmedê Elî Gozila, Misalmê zaxoyî, Nekûşî û Ezdîn Şêr...

Ezê

Ezê li ser Similê

Ezê li ser Similê ketim, mehalê seran û bihare,

Li ezmana qîrîna we, mîratê di Tiya,
Li erdê qîrînê di exsîra û nalînê di birîndara,
Similê xopan we bi gire û eşîret hatin û çarnîkarê girgire,
Heyf û mixabinî destê Tiya-riya û baziya,
Girtine û dane ber xencera,
Mîrata Similê we bi nuwal e,
û çarnîkarêd wî esker girtin bi trombêla,
û gazî eşîreta kirin:
werine mala û ji xwe re bibin e'rz û e'yala,
Simila rengîn li erdê raste,
Esker destê lawê Tiya-riya girtin û ser xwînê hêlemiste...

Ji stranên **Tor Abdîn**

Civandin, derxistin û wergerandin bo Almanî: **EUGEN PRYM** û **ALBERT SOCIN**, St.- Pétersbourg, 1887
[Tîpguhastin: **Cankurd**]

Farisê Dodo

Carik ji cara, car zemana, (1)
Farisê Dodo, Dalo eslana.
Rikêba hiltînin bi darê rumana,
Dikevin trat û meydana,
Gurza hiltînin li ser milana.
Ji mala Farisê Dodo bîst û du xortana.
Li dor qesra Birahîm axa şerkî girana.
Ji mala Birahîm axa heşt birana.
Serê xwe li hev dixin ferh û berana,
Heçî xatûna çavbelek bikşênê bi darê zorana,
Wê bidin (bibin) ji Farisê Dodo ra, ya (Faris)ê Dalo eslana.
Biran (bira) nadin xûşkê wana,
Herro li wê derê şer girana,
Şerrik li dor qesrê girana,
Li hev dixin bi rum û gurzana,
Didu ji mala Faris axa kuştiye.
Yek ji mala Îbrahîm axa birîndare,

Li lingêd hespa nema tu nale...
Dilê min dadiye,
Mala Faris axa hijûm kiriye...
Xatûnê çavbelek ji qesrê kişandiye,
Faris axa xatûnê çavbelek biriye.
Hêvarê Birahîm axa ji gunda hatiye,
Di dûv mala Farisê Dodo ketiye.
Birahîm axa xwe bi wa gihaştiye,
Şer bû kifristaniye.
Birahîm axa tiştik bi mala Farisê Dodo nekiriye,
Korî poşman (wek: porî poşman) vegeriye,
Lê didu ji mala Faris axa kuştiye,
Bira yê wî birîndar bû miriye,
Birahîm axa rabû piye,
Şergeh û kemîne kiriye,
û e'sker civandiye.
Bi baskê mala Faris axa çûye,
Şer ters û talan hiştiye,
Ters û talan aniye,
Çar qîz û du kur bi xwe raaniye, li mal daniye.
Hêvarê mala Faris axa bi derketiye,
Dûv wa da ajotiye,
Şer li dora gunda kiriye.
Faris axa Dalo eslana, î hatiye,
Awê Faris axa hatiye,
Şer li dor gunda kiriye,
Çar gund batmîş kiriye,
Agir di nav da berdayiye.
Didu ji bira yê Birahîm axa kuştiye,
Yesîrê xwe aniye,
Birahîm axa yesîr girtiye,
Heta mal şenq kiriye.
Ji nu va xatûna çavbelek li xwe mehir kiriye.
Faris axa go me didu kuştiye û me didu dayiye....

1. Tîpa (a) li dawîya rêzikên vê parçeyê wek lêvkirina xelkê Cizîrê tê lêvkin.

Strana Ferh'ô

[Ji berhevoka *Socin û Prym*]

Tîpguhastin: Cankurd

Go carik ji cara çar zemana
Li mala Ferh'ô çar birr bira ne
Pev li Ferh'ô pênc bira ne
Wekê Ferh'ô gotiye
Go gelî birano, gotin çîye bira (bira çîye!)?
Go me qîzek ji xwe (te) re diye
Çar qantira pere bar kiriye
Pi (bi) seriyê danêrê ketiye
Li mala Iskan Axa daniye
Go Ferh'ô h'ale h'ewalê te çîye?
Go me çar bar pere aniye
Ji boyê Xecko (Xeçko), ji boyê xwezgîniye
Diyê Xecko qebûl ne kiriye
(Ferh'ô) pere li wê derê hişt û vegeriye
Telbê mal kiriye
Ew li mal rûniştiye
Bira gotnê te çî kiriye?
Go me pere li wê derê hiştiye
Wez (û ez) vegeriyam...
Diyê Xecko qebûl ne kiriye
Bira, gotnê go rûne hêdiye
Hetta salê emê herin jê bixwazin bi qenciye
Heke neda emê bikin şerkê bi e'cêbiye
Axlere dengê Xecko bihîstiye
Ji hemû baska hatin Xecko ji boyê xwezgîniye
Lê Iskan Axa Xecko ne dayiye
Axlere li mala Iskan Axa kom bûye
Iskan Axa dûv mala Ferh'ô şandiye
Mala Ferh'ô her pênc bira hatiye

Hemî civiyan ji boyê Xecko, ji bo xwezgîniye
Ew dibêje me re (ji me re) , ew dibêje mere (ji me re)
Iskan Axa go me şertek li holê daniye
Me gurza h'edîd (hesin) ji sîh rotila, me çêkiriye
Me li meydanê daniye
Heçî gurze hilaniye
Ser milê xwe daniye
Me Xeçko (Xecko) jê re behbiş (behpêş: diyarî) kiriye
Suwara suwar bûn û kom bûyiye (bûyîne)
Belê yekyek daketin gurzê gurz hilaniye
Ferh'ô qeh'eriye
Her pênc hespê bira kuştiye
Ferh'ô (Ferxo) gurze hilneaniye
Iskan Axa suwar bûye
Ew bi tenê daketiye
Kir û ne kir gurze hilneaniye
Iskan Axa gazî kir Çetto (Çeto), xulamê wî ye
Xecko li şibakê temaşa kiriye
Çeto Saxla (navê mehî'nê ye) wî ji tewlê bi deraniye
Bi baskê gurzê ve kişiyê
Ev Çeto gurze (gurz) hilaniye
Gurz li ser milê xwe daniye
Çeto hatiye, gurz li ber şibakê avêtiye
Go (bê go) ez kilê cave te me
Mi gurze (gurz) aniye
Xeçko go (bê Xeçko):
Ev can (canê min) ber qibalê te ye, bi h'elaliye
Iskan Axa got ji axlera re: Rabin piye
Yek ji we gurze (gurz) hilneaniye
Çeto gurze hilaniye
Mi qîza xwe lê mehir kiriye
Ferh'ô enirî, rabû piye
Her çar birê (birê wî) pê ra biriye
Bi baskê mal ve kişiyê
Du meha li mal rûniştiye
Ferh'ô vê tee'nê (lêdanê) hilneaniye

Her çar birayê xwe suwar kiriye
Telbê mala Iskan Axa kiriye
Yabo, şev a reş tariye
Ferh'ó erdewanek aniye
Ewe bi odê çûye
Çeto û Xeçko razayî ye
Çeto li ber şûra daniye (xistiye)
Ferh'ó rahişte Xeçko kişandiye
Qîrên bi Xeçko ketiye
Cemedana xwe li devê Xeçko şidandiye
Rabû Xeçko teslîmê suwara kiriye
Hetta Ferh'ó nazil bûye
Ewe suwarê hespê xwe bûye
Hewarê mala Iskan Axa bi der ketiye
Iskan Axa dibê Ferh'ó hatiye
Çeto li ber şûra daniye (xistiye)
Xeçko jî xwe ra biriye
Hewarê bi suwarê mala Ferh'ó gihaştiye
Şerkê li meydanê kiriye
Ferh'ó Xeçko ji hespê avêtiye
Di dûv hewarê ketiye
Bîst zilama ji hewarê mala Iskan Axa, Ferh'ó kuştiye
Ewe Ferh'ó hat û vegeriye
Xeçko li dûv xwe suwar kiriye
Bi mal ve taniye (daniye)
Xeçko li xwe mehir kiriye
Iskan axa bihîstiye
Ferh'ó Xeçko li xwe mehir kiriye
Iskan Axa karê xwe kiriye
Herê Cizîrê lê bikê giliye
Gilî kir ne boriye (ne qediye)
Birrik suwara bi xwe ra hilaniye
Pi (bi) ser mala Ferh'ó girtiye
Ferh'ó her çar birayê xwe suwar kiriye
Di nav (bi nav) suwarê mala Iskan axa ketiye
Didu ji birayê Ferh'ó kuştin, ew pênc ji suwara kuştiye

Iskan Axa korî poşman vegeriye
Ewe tiştik ne kiriye
Hat li mal rûniştiye
Day ji galgalê kiriye
Iskan Axa go însallah xêr e
Mi weqas zilame da, bimbarek bê jêr e
Dibêjin ew êtûna xweş êtûn e (dûjeh e)
Li wê derê her ro (herroj) şer û pevçûn e
Serê we guhdara xweş bê li şûn e...

[1]) Piraniya serrastkirinan, ku di nav kovanan de hatîne, yê Socin û Prym bi xwe ne, hinek jî yê Cankurd in.

[2]) Ev êla Gêsa êleke ermenî ye.

[3]) Leyla navê mehîna Ehmedê Şeng e (Cankurd)

[4]) *Di vir de dijûneke nebaş bo wan dibêje,*
bi wateya Ker bi jin û mêyên we re li gan keve... (Cankurd)